

Ziman Zar

Jimre 4 - puşper - 2722- hawînî 2022

Govarekî zimannasî ya werzî ye

Xudan îmtiyaz:

Dr. Teha Resûl

Sernivîser:

Fereydûn Saman

Sernivîserê fexrî:

tofîq wehbî beg

Desteya şîretgerî:

- p. d. wrya omer emîn
- d. mizgîn çalî
- d.dara hemîd
- kameran rehîmî
- îdrîs lawe

Rawêjkara kargêrî:

Evîn ehmed

peywenî:

Sara seadî

Xezan baban

ji bo peywendî bi kovara ziman u zarî:

fereydunsaman61@gmail.com

00964 750 448 0493

Ziman û Zar

Jimre 4 _ puşper _ 2722_ hawînî 2022

Govarekî zimannasî ya werzî ye

Serrastker: kûkman m.şilanî
dîzaynî nawewe: umêd mihemed
berg: aram elî
çap: 2022
tîraj: 500 dane
nrx: 5000 dînar
çap: çapxaney taran



damezrawey kerîmî eleke ê
navenda Xanî ji bo lêkolînên hizrî derdixe

QANATÊ KURDO ZIMANAS, WEKÎ BINGEHÊ KURDNASÎYÊ.

■ nivîsîna: d.Tosinê Reşîd

Kurdên Yekîtiya Sovêta berê, çiqwas jî bi jimara xwe ve ne mezin bûn û tenê li Ermenîstan û Gurcîstanê hinek îmkân dabûne wan, lê dîsan jî ji wan re li hev hat îmkânên heyî ji bo bi pêş va birina ziman û çanda netewî bi kar bînin. Ji nav wan gelek zanîyar û nivîskarê bi nav û deng derketin, ku yek ji wan kurdnasê bi nav û deng Qanatê Kurdo bû, ku îsal 100 salîya jî dayîk bûna wî temam dibe.

Qanatê Kurdo yek ji mezintirîn ronakbirê kurdî sedsalîya XX e. Ew yek ji wan kesan bû, wekî bingehe kurdnasîyê li Yekîtiya Sovêtê danîn.

Qanatê Kurdo 12 ê Îlonê sala 1909 an li gundê Sûsîz, navça Digorê, ku bi Qersê va girêdayî bû, di malbeteke cotkaran de ji dayîk bûye.

Salên Cenga Cihanîyê ya Yekemîn, malbeta Qanatê Kurdo jî mîna bi hezaran malbetên kurdên êzdî, yên Serhedê, mal û milkê xwe, welatê kal bavên xwe dihêlin û ji ber zilma Roma Reş direve Ermenîstana îroyîn.

Gava Piştî Şorişa Cotmehê artêşa Rûsîya ji Kavkazê dikşe, artêşa tirk pareke Ermenîstanê dagir dike û bi hezaran kurdên êzdî, qir dike. Ji malbeta Qanatê rengîn tenê çend kes difilitin.

Lê Ermenîstan bi xwe wêrankirî û bi peneberên ermenî ve tijî bû, ji ber wê jî ew koçî Tilbîsê, serbajarê Gurcîstanê dikan.

Sala 1921-ê bavê Qanat, Kurdo diçe ber dilovanîya Xwedê, dayka wî zûtirkê merekî mayîn dike û pismamê wî (bavê min-T.R.), Reşîdê Ozman, ku şeş salan ji Qanat mezintir bû, wî hildide bal xwe.

Sala 1922 an Lazo (Hakob Xazaryan) û Ahmedê Mîrazî li Tibilîsî dibistana kurdî, ya bi êvaran, vedikin. Xwendina zimanê kurdî bi alfabeya ser bingeha tîpên ermenî bû, ku Lazo sala 1921-ê çê kiribû û yekemîn pirtûka zimanê kurdî, “Şems”, li Ermenîstanê bi wê alfabeyê ronahî dîtibû. Qanat xwendina xwe li wê dibistanê dest pê dike. Wî bi roj pêlav paqij dikirin, bi êvaran jî diçû dibistanê.

Sala 1928 an bi berpeyvka Erebê Şemo, Komîta Navendî ya Partîya

Komûnîste Ermenîstanê 8 xortên kurd ji bo xwendinê dişîne Lênîngradê, (S. Pêtêrbûrga niha); ji wan xortan yek Qanatê bû.

Ew ji bo fêr bûna ziman berê dikeve fakûlta Karkeran û piştî temam kirina wê fakûltê xwendina xwe li zanîngehê berdewam dike. Wan salan êdî zên û zîrekîya wî berbiçav bû; bi xwendkarîya zanîngehê re tevayî, ew li fakûlta karkeran dibe mamostayê zimanê kurdî.

Salên xwendkarîyê (1933) ew (bi E. Şemo û Î. Sûkêrman ve) du gotarên zanîyarî çap dike, ku şorişek bûn di zimannasîya kurdî de. Cara yekemîn ew mak dike, wekî katêgorîya cinsa (gende kategory) di zimanê kurdî (zaravê kurmançî) de heye.

Piştî xwendina bilind seroketîya zanîngehê û bi taybetî rojhilatnas Î. Orbêlî û A. Freyman dixwezin ew li zanîngehê bimîne û lêkolînên ser zimanê kurdî berdewam bike. Ew yek daxweza dilê wî jî bû û ew bi seroketîya îrannasê naskirî, profêsor A. Freyman têza xwe PhD bi têma “Çê kirina lêkerên bargran di zimanê kurdî de” (bi zimanê rûsî; “Образование slojnix glagolov v kurdskom yazike) dinvîse, pawan dike û dû re li înstîtûta Êtnografîyê lêkolînên xwe didomîne.

Gava Almanîya nazî sala 1941-ê êrişî Yekîtiya Sovêtê dike, Qanat xwebexşî diçe ber şêr û çawan qumandarê deşta topvanan heta dawîya cengê şer dike û hêjayî gelek meêdal û ordêna dibe.

Piştî şêr ew li Zanîngeha Lênîngradê dibe lêktorê zimanê kurdî. Gelek şagirdên wî, yên wan salan, wek Margarîta Rûdênko, Rûslan Sabolov, Zerê Yûsûpova, dûarojê dibin kurdnasên naskirî. Qanatê Kurdo wan salan usan jî li Înstîtûta zanyarîyê, ya Antropologîyê kar dike û pêra jî hevkarîyê bi înstîtûta Rojhilatnasîyê re dike.

Gava sala 1958 a di deştûra komara Îraqê de hinek mafên kurda hatin naskirin, li Yekîtiya Sovêt pirsê kurdan bi carekê ve bû aktûal. Li beşên înstîtûta Rojhilatnasîyê, yên Lênîngradê, Moskva û Yêrêvanê parên

kurdnasîyê hatin vekirin, li Bakû, Tbilîsî, Samarkand dest bi lêkolînên kurdnasîyê bû.

Kabînêta kurdnasîyê li beşa Lênîngradê, ya înstîtûta Rojhilatnasîyê Sibata sala 1959 an hat damezirandin û rojhilatnas û kurdnasê bi nav û deng, dostê gelê kurd, Hovsêp Orbêlî bû yekemûn serokê wê. Lê piştî çend heyva wî seroketîya wê kabînêtê sparte Qanatê Kurdo, ku heta dawîya jîyana xwe, sala 1985 an seroketîya wê ocaxa kurdnasîyê kir.

Bi seroketîya Q. Kurdo Kabînêta Kurdnasîyê, bû navenda kurdnasîyê, ya here navdar li seranser cihanê. Hema li wê Kabînêtê û bi xemxurî û seroketîya Qanatê Kurdo bû, wekî lêkolînên berfireh ser ziman, dîrok û wêjeya kurdî hatin kirin, berhemên Şeref xan Bîdlîsî, Ehmedê Xanî, Melle Mehmûd Bayazêdî, Xosro xan Banî Ardêlan, Meştûre Ardêlanî, Herîs Bîdlîsî, Feqîyê Teyran û gelekên mayîn bi orîgînal û wergera zimanê rûsî hatin çap kirin., ser van berhemên lêkolînên zanîyarî hatin kirin.

Qanatê Kurdo bi xwe serkêşê wan lêkolînan bû. Pêşekzana dîroka gelê kurd, profêsor Yêv. Vasîlêva di derheqa karê wî de dinvîse: “Dijwar e di karê profêsor Qanatê Kurdo de wan problêman cihê bikî, ku ji bo wî bêtir balkêş bin. Zanîyarê bi bîrewerîya ênsîklopêdîsta, temamiya jîyana xwe da lêgerîna aloztirîn pirsên zimanê kurdî û zimanzanîyê, lê pêra jî dîrok û dîroknûsîya kurdî ji demên lape kevn heta demên nûtir, ji goveka balkêşîya wî, ya zanîyarîyê, der neman”.

Pênûsa Qanatê Kurdo gelekî bi adan bû, wî dor 85 pirtûk û gotarên zanîyarî çap kirin. Ew berhemên wî beşên kurdnasîyê tevan hildigrin nav xwe. Lê Qanatê Kurdo berî gişkî zimanzan bû. Çawan profêsoza zimanzan, Zera Êsiv (Yûsûpova) dinvîse; ‘Di çareserkirina pirsgrêkên rêzimana kurdî, yên mezin de, Qanatê Kurdo yê yekmîn e’.

Sala 1934-an, hê xwendkarê zanîngêhê, Q. Kurdo li Yêrêvanê beşdarî yekemîn konfêransa kurdnasîyê dibe û gotara “Bîngêhên rêzimana kurdî” dixwîne.

Wan salan li rojnama ‘Rîya Teze’ çend gotarên wî ser pirsên zimanê kurdî çap dibin, lê sala 1936 an pirtûka wî “Gramatîka zimanê kurdî, ya kurt” li Yêrêvanê bi zimanê kurdî çap dibe. Ji sala 1949 an dest pê kirî zarokên kurd li Ermenîstanê û komarên Yekîtiya Sovêtiye mayîn, bi pirtûkên wî amade kirî fêrî rêzimana zimanê kurdî dibûn. Pirtûkên wî; ‘Gramatîka zimanê kurdî’ ji bo dibistana destpêkê, ji bo klasên 3,6-5 ,4-8-7 û ji bo dibistana navîn, heta sala 1985 an gelek caran tên çap kirin.

Sala 1957 an Qanatê Kurdo pirtûka “Rêzimana zimanê kurdî (kurmançî)”, (bi rûsî: „Gramatika kûrdskowo yazîka, (Kurmançî) , fonetîak, morfologiya „) ya akadêmî çap dike. Çawan Dr. Ebdirehmanî Hacî Marf dinvîse “Bo yekem car le Sovêt û le mêjûy kurdnasîda Leser şêweyekî zanîstî kitêb le barey zimanî kurdiyewe blakirayetewe, belko sereray eweş twanra le dû kitêbeda gelêk karî aloz û naaşkira le rêgeyekî zanîstiyewe xawbikrêtewe û aşkira bikirê, wek: dozînewey nê û mê û dabeşkirdinî naw be seryanda; xawkirdinewey hendê alozî le regî kirdar û le pêşgir û paşgirda; şewey kirdarî (transitive) le katî rabûrdûda; hereweha gelêk meseley giringî tir ke ta derçûnî em du berhemey mamosta Kurdo baş lêyan nekolrabûwe” .

Kurndas-zimanzan Î. Sûkêrman seva wê pirtûkê dinvîse “Serketina vê pirtûkê ew e, wekî bi şêweyekî zanîstî hatîye nivîsar. Q. Kurdo ne tenê lêkolîna zimanê kurdî kirîye, lê usan jî rêya lêkolîn û fêrbûnê destnîşan kirîye” .

Kurndasên zimanzan Rojen Leskot, Tomas Boi û Çerkezê Beko jî gelek baş seva vê berhema Q. Kurdo nivîsîne.

Hêjaye bê gotin, wekî cara yekemîn Q. Kurdo di wê pirtûka xwe de çawan nimûnên têkstên kurdî çend şîrên Cegerxwîn çap kirin, kurdên Yekîtiya Sovêtiye berî gişkî bi vê pirtûkê bi berhemên şairê mezin re bûne nas.

Sala 1960- î ew ferhengî ‘Kurdî (kurmancî) – Rûsî’ çap dike (bi rûsî ‘Kurdsko-Rûskî slovar’), lê sala 1983 bi Zera Êsiv ve ferhengî ‘Kurdî (sorani) - Rûsî’ çap dike.

Seva ferhenga yekemîn Î Sûkêrman dinvîse; “ Mezintirîn berhema zanyarî e di kurdnasiya Sovêtê da.” .

Sala 1961-ê pirtûka Q. Kurdo, ya zanîyarî “Zimanê kurdî” (bi zimanê rûsî ‘Kurdski yazik’) li Moskva çap dibe.

Salên 1950 emîn, bi rêya kurdnasê nav û deng Vladîmîr Mînorskî kovar û pirtûkên kurdî bi zaravê kurmancîya jêrîn(sorani) dikevin destê Qanatê Kurdo û ew dest bi fêrbûn û lêkolîna zaravê kurmancîya jêrîn dike. Sala 1966 an ew têza doktorîyê bi sernavê “Beranberkirina rêzimanên dialêktên kurdî; kurmancî û soranî”, (bi rûsî „Gramatika Kûrdskovo Yazîka na metêrialê dialêktov kurmandji î soranî“) pawan dike. Sala 1978 an ew têza wî çawan pirtûk çap dibe.

Berhemên Q. Kurdo di zimanzanîyê de bi şe şaxan bi pêş ve çûne; Lêkolîna rêzimana zaravên kurdî; himberî hev kirina zaravan, a rêzimanî; amade kirina ferhengên zaravan.

Q. Kurdo baş zanibû, wekî ji bo standar kirina zimanê kurdî lêkolîna zaravan gelek giring e û ji salên 1950 emîn, bi seroketîya wî li kabînetê Kurdnasiyê dest bi lêkolîna zaravaên kurdî, bi taybetî yên Başûr-Rojhilata Kurdistanê dibe. Ew bi xwe piştî berhema ser beranber kirina zaravên soranî û kurmancî, dest bi lêkolîna zaravê dimilî (zaza) dike. Sala 1975 ew bi navê “Lêkolîna Zaza” berhemeke zanîyarî bi zimanê rûsî ji bo çapê amade dike, lê hê jî nehatîye çap kirin.

Ji salên 1980 emîn Qanatê Kurdo li kabînetê Kurdnasiyê pirsar lêkolîna zimanê peykarên kurdîye nivîskî datîne, bi taybetî ew ên bi zaravên hewramî û goranî. Şagirtên wî, bi taybetî prof. Zera Êsiv, vî karî bi rûspîtî bi pêş ve dibin.

Hêjayî gotinê ye, wekî piraniya pirtûk û gotarên Q. Kurdo ji aliyê Dr. Abdûrehman Hacî Marf, Dr. Kurdistan Mukryani, Dr. Şukrye Resûl, Proffêso Marf Xeznedar, Dr. Cemşîd Heyderî, Dr. Îbrahîm Ezîz, Dr. Enwer Qadir Mihemed û Şukir Mişefa de bi zimanê kurdî (kurmancîya jêrîn) hatine wergerandin û çap kirin.

Q. Kurdo di pirsê amade kirina kadroyên kurdnasîyê de karekî bê hempe kir. Mirov dikare bêje wî bi tenê karê zanîngehekê kirîye. Huvdeh kesan bi seroketîya wî tîzên xwe, yê doktorîyê ser pirsên kurdnasîyeyê cûr bi cûr anade kirine. Nav wan şagirdên wî de kesên ji rojhilat, başûr û rojava Kurdistanê hebûn. Şagirdên wî usan jî ji Gurcistanê, Tûrkmênistanê, Azêrbacane, Ermenistanê û Rûsîya hebûn. Cîhe bê gotin, wekî bilî Qanatê Kurdo, ji kurdnasên kurde Yekîtiya Sovêtê, tenê Hecîyê Cindî doktorek amade kirîye.

Xên ji wan kesên wî bi xwe seroketî lê dikir, Qanatê Kurdo usan jî bi şêwir û şîretên xwe alî kadroyên kurdnasîyeyê mayîn dikir. Kesên berbi wî biçûna tu caran destevala venedigerîyan.

Gîyana Qanatê Kurdo bi kurdîyetîyê ve tijî bû, kurdîyetî ji wî dibarî! Kurdîyetî ji bo wî “nexweşîke înfêksyon” bû û ew “nexweşî” pir lez ji wî derbasî xelkên dorê, şagird, dost û hevalên wî dibû.

Şayîrê bi nav û deng, Ebdela Peşêw seva Qanatê Kurdo dinvise; ‘Mamoştê Qanatê Kurdo, yekeke le pyawe herre mezinekanî kurd. Çi wek kesayetî, çi wek zana, çi wek niştimanperwarekî kurdisantani, cêpencey beser dîroknawewe dyare û ta bê zêtirîs derdekewê.

Her li yekem hevdîtinda germîyek kewte nêwanmanewe, eger çî min le hemû ruwêkewe hemîşe xom be şagirdêkî ew dezanî û îştas her heman heştîm heye.

Ew “Şorrşgerr” nebû, bellam xetertirîn sengerî hellbijardibû: Sengerî berxodanî gîyanî, sengerî parastinî nasname’.

Gerek bê gotin, wekî Qanatê Kurdo piştovanê alfaba kurdî, ser binga tîpên latînî bû. Ew bi wê bawarîyê bû, wekî alfaba bi tîpên kîrîlî bi zor stuyê kurdên sovêtê pêçane û çiqwas zû ji wê rizgarbin, ewqas baş.

Wî di pertûkên xwe, yên zanîyarî de têkstên kurdî tenê bi alfaba latînî didan, ew jî gava li Yekîtiya Sovêtê bo kurdan alfaba kîrîlî bi fermî hatibû pejirandin.

Q. Kurdo piştovanê nasîyonalîzma kurdan bû bi ramana baş. Wan sala li dewleteke wek Yekîtiya Sovêtê, nasîyonalîzma usa mêranî dixwest. Û Qanatê Kurdo xwedîyê wê mêranîyê bû. Ew yeka gişka zanibû, gişka texmîn dikir û carana dijî wî bi kar dianîn.

Gava gor beyana 11-ê Adarê li Silêmanîyê Zanîngeha kurdî vebû, ji bo xwendina kûrseke ser zimanê kurdî Q. Kurdo vexwandin Silêmanîyê.

Gelekî şa bibû, armanca wî ya salan, ku li zanîngeheke kurdî ser zimanê kurdî lêksya bixwîne, pêk dihat. Demeke dirêj xwe amade dikir. Lê berî çend roja, wekî gerek biçûya, jê re gotin, wekî destûra çûyîna wî nedane. Wî zanibû, wekî ji bo kurdperwarîya wî rê nedanê here Kurdiştanê û ew yek ji bo wî derbeke pir giran bû. Wî, ku heta hingê tu caran cigare hilnedida destê xwe, dest bi kişandina cigarê kir. Çend meha usa di xwe da ponijî bû, kêma dipeyivî, kêma ji mal derdiket. Teherekî ketibû xudîkê, depression ê.

Piştî wê bûyarê ji min re got, wekî salên Cenga Cihanîyêye Duyemîn, gava artêşa Yekîtiya Sovêtê ketibû rojhilata Kurdiştanê, wî pir dixwest ji bo berevkirina matêrîyalên ser zimanê kurdî here Kurdiştanê. Lê hingê jî rê nadine wî, çend kurdên mayîn dişînin.

Qanatê Kurdo komûnîst bû û wî yekemîn armanca xwe çawan komûnîst di xizmetkirina gelê kurd de didît, yek ji bindesttirîn gelên li rûbarê cihanê.

Gava piştî beyana 11 Adarê sala 1970 î li Îraqê Akadêmîya Kurdî tê damezirandin, di yekemîn rojê de Qanatê Kurdo wek endemê kara tê hilbijartin..

Sala 1974 an, gava Yekîtiya Sovîet bi giştî piştî rêjîma Îraqê digirt û media sovêtê herdem dijî seroketiya kurdan dinivîsî, Q. Kurdo bi şeweyekî vekirî piştgirtina şorişa Başûra Kurdistanê dikir û li her dera siyaseta Yekîtiya Sovêtê rexne dikir. Ji bo bîr û bawariyên ha, wan salan mêranîke mezin pêvîst bû û Q. Kurdo xwedîyê wê mêranîyê bû.

Q. Kurdo di meydana kurdnasiyê de xebatkarekî bê weşan bû. Ew tu caran di pirsê kurdan de bêdeng nema, ji tu kesî re serî danenî. Di temamiya jiyana xwe de ji bo parastina berjewendiyên gelê kurd, ziman, dîrok û çanda gelê kurd bi mêranê xebat dikir.

Çi rojhilatnasên nav û deng, çi kurdnasên wek O. Vîlçevskî, Î. Sûkêrman, G. Akopov û yên mayîn, eger di pirsên kurdnasiyê de sextekarî bikirana, dijî berjewendîya gelê kurd binvîsiyana, gişka zanibû, wekî hema Q. Kurdo wê wan şasiya derxe meydanê û rexne bike. Û li wê meydanê jî Qanatê Kurdo tenê bû.

Çendek ji wan gotarên wî, yên rexnegirîyê, çawan pirtûk bi zaravê kurmancîya jêrîn li Bexdayê çap bûne.

Sala 1984-a, ji bo 75 salîya ji dayîk bûyîna Q. Kurdo li beşa Lênîngradê, ya înstîtûta Rojhilatnasyê civîneke pîrozbayêye mezin hat bi dar xistin. Rojhilatnasên nav û deng, heval û hogirên wî yên salan, nonerên hukumatê, bi dilgermîke mezin ew pîroz dikirin, kar û xebatên wî carekê jî dinirxandin. Lê gava dora wî hat û gişk bendê bûn wê ji gişkan re spasîyên xwe bêje, wî bi tûndî seroketiya înstîtûta Rojhilatnasyê rexne kir, wekî baş guh nadin pişka kurdnasiyê, wekî Yekîtiya Sovêtê di siyaseta navnetewî de granîyê nade rewşa gelê kurdî bindest.

Qanatê Kurdo mirovekî bînfireh û nefstenik bû, bi biçukan re biçûk bû,

bi mezinan re mezin bû. Di pêwendîyên xwe de pir vekirî bû, çî di dilê wî de hebû, ew jî ser zarê wî bû. Pir raştgo bû.

Xwendkarên kurde ji herçar perçên Kurdistanê, ku li Lenîngradê dixwendin, tim caran dibûn mêvanê wî, ew carna diçû jûrên wane biçûk. Û ew mêvandarî tu caran bê stran û govend ne dibûn. Wî gelek folklorê kurdî hiz dikir, bi taybetî govend û bi xwe jî di govendê de diştira.

Di xeysetê wî de zarotî heta mirinê jî ma. Ji her tiştî bawer dikir, bi her gotineke baş hayecan dibû. Ji mirovên xwe, dost û hevalan re gelek xemxur bû. Mîna zaroka nikaribû ne şabûn, ne hêrs, ne jî dilmayîna xwe veşêre.

Wî xort hiz dikirin. Bi mirovên hevçaxê xwe re sebra wî ne dihat. Ji ber vê jî dor wî timê xort bûn; bi wan re şa dibû, bi wan re diştira, bi wan re govend digirt.

Seva wî mal, hebûn, dirav, tu nîrxên wan tune bûn.

Gava ew ji Cenga Cihanîyê Düyemîn vedigere, ji Akadêmîya Artêşa Sovêtiyê wî vedixwînin û dibêjin were ji me re kar bike, em ê xanî bidine te (xanîyê wî dema cengê wêran bibû) û mehê pênc hezar rûblî bidine te. Lê dibêjin tu gerek pîrsên kurdnasîyê bihêlî. Ew berpeyvka wan napejirîne, ji ber ku zane wekî bêtir kurdnasîyê nikare bijî. Û bi mûçê mehê hezar hevsid rûblî (dewsa pênc hezaran), di jûreke apartmênta giştî de, karê xweyî kurdnasîyê berdewam dike.

Zanebûnên wî, yê ser kurdan bi raştî ênsîklopêdî bûn. Te çî pîrs ji ziman, dîrok, dîroka wêjeyê, netewenasîyê, folklorê, bi gilîkî her şaxê kurdnasîyê bidayê, bersiva wî têra te dikir.

Qanatê Kurdo çawa kurdnas berî gişkî zimanzan bû. Rêziman û ferhengên wî di zimanzanîya kurdî de berhemne bingehîne, fûndamêntalîn. Lê wî pirtûk û gotarên zanîyarîyê usan jî ser dîroka gelê kurd, wêje, dîroka wêjeya kurdî, êtnografiya, ol, folklor û dîroka kurdnasîyê çap kirine.

Gerek bê gotin, wekî piranîya berhemên wî yê zanîyarîyê, ku bi zimanê rûsî hatine nivîsarê û çapkirinê, hê jî ji bo gîrsa ronakbir û zimanzanên kurd ne nasin, agaha wan jê tune.

Havîna sala 1984 an bizîşka bal wî penceşêr (kancêr) dîtin û niştegerî kirin. Lê alî nekir. 31 – ê Cotmehê (Oktobr) sala 1985 an dilê wî mirovê Mezin rawestîya, wî kiras guhêrî.

Qanatê Kurdo ji gelê xwe re mîrateke mezin hîşt; deste kadrên kurdnasîyê, navendeke kurdnasîyê, ku seranser cihanê hatîye naskirin, hewştêyî zêdetir pirtûk û gotarên zanîyarîyê.

Raşt e piranîya berhemên wî bi kurmancîya jêrin hatine wergerandin û weşandin, lê bi kurmancîya jorîn, ku piranîya berhemên Q. Kurdo ser rêzimana wî zaravîne, kêmtîşt hatîye çap kirin, çî ku hatîye çap kirin jî bi kêmtî û kurtî hatîye kirin.

Dor deh berhemên wî jî, wek “Lêkolîna zaza”, “Dîroka kurdnasîya Rûsîya û Yekîtîya Sovêt”, û çendekên mayîn hê jî çap ne bûne.

Baştirîn rêya rêz girtinê ji bo zanîyaran, ew çap kirina berhemên wan e. Îsal 100 salîya ji dayîk bûna Q. Kurdo temam dibe. Wê baş bibe, berhemên wî, yê sereke bi kurdî (kurmancîya jorîn) bîn wergerandin û çap kirin. Usan jî deh berhemên wî, ku hê jî neçapkirî ne, bîn çap kirin. Divêt ew dewlemendî bigihîje destê xwedîyê xwe, gelê kurd.

Em ê li jêr navê çend pirtûkên Qanatê Kurdo, yê giring raberî we bikin:

‘Gramatîka zimanê kurdî, ya kurt’ (bi kurdî) Yêrêvan-Tbilîsî, 1936

‘Gramatîka zimanê kurdî’ ji bo dibistana destpêke, (bi kurdî) Yêrêvan 1949

‘Gramatîka zimanê kurdî’ ji bo dibistana navîn (bi kurdî) Yêrêvan 1956

‘Gramatîka zimanê kurdî, kurmancî, fonetîka, morfologîya (berhema akadêmî) (bi zimanê rûsî) Lênîngrad AZ YKSS, Înstîtûta Rojhilatnasîyê. 1957

‘Gramatîka zimanê kurdî’ ji bo dibistana navîn (bi kurdî) Yêrêvan 1960
 Ferhenga Kurdî (kurmançî)-Rûsî (34.000 peyv) Moskva 1960
 Zimanê Kurdî, (bi zimanê rûsî) Moskva, Înstîtûta Rojhilatnasîyê 1961
 ‘Têkştên folklorê kurdî’ (bi kurdî) Korî Zanîyarî Kurd, Bexda 1976
 ‘Gramatîka zimanê kurdî ser bingeha zaravên kurmançî û soranî’ (bi rûsî) Moskva “Naûka” 1978
 Gramatîka zimanê kurdî (ji bo klasên 34-) Yêrêvan, 1979
 Gramatîka zimanê kurdî (ji bo klasên Yêrêvan, 1979
 Gramatîka zimanê kurdî (bi kurdî) Frankfurt ser Mayne, Komkar, 1981
 Tarîxa edebiyeta kurdî c.1 1983, ‘Roja Nû’, Stockholm
 Tarîxa edebiyeta kurdî, c. II, 1985, ‘Roja Nû’, Stockholm
 Ferhenga Kurdî(soranî)-Rûsî, (bi Z. Yûsûpova re) Moskva 1983
 Gramatîka zimanê kurdî (ji bo klasên 56-) Yêrêvan, 1985
 Mem û Zîn, 12 şax, Roja Nû, Stockholm, 1996
 Nivîskar: Tosinê Reşîd

Perawêz :

- 1- Lazo (Hakob Xazaryan) ermenîyê ji bakûra Kurdistanê bû, kurdî gelek baş zanibû. Wî sala 1921 ê alfabea kurdî ser bingeha tîpên ermenî çê kir û yekemîn pirtûka zimanê kurdî “Şems” çap kir. Ew usan jî xudanê yekemîn çiroka kurdî ye li Yekîtiya Sovêtê.
- 2- 90 salîya ji dayîk bûna zimanzanê mezin Qanatê Kurdo, Amade kirina Husên Hebeş û Tosinê Reşîd, Hogir, Bonn, 2000, rû. 50.
- 3- Dîsan li wir, rû. 7.
- 4- Profêsor Qanatî Kurdo, “Kurdoyêv”. Hendêk bîrûbawerî helle le beraey ziman û mêjû kurdewe. Wergêran û pêşekî Dr. A.H. Marif, Bexda 1973.
- 5- Dr. A.H. Marif, Çi li barey zimanî kurdiyewe nûsrewê, Bexda, 1974.
- 6- Dîsan li wir.
- 7- Ebdella Peşêw, Yadi kellepyawek, Li pirtûka “90 salîya ji dayîk bûyîna zimanzanê mezin Qanatê Kurdo”, rû. 108.

DI ZIMANÊ KURDÎ DE ZAYEND

■ Bahadin Robar

Zimanê Kurdî di nava malbata zimanên Hîn-Ewropî (Arî) de cih digire. Lewre taybetmendiyên vê malbatê din av xwe de dihevine. Hin taybetmendiyên vê malbata zimanan ên sereke û bingeîn ev in; zimanên Hînd-Ewropî tewangbar, bikêşîner û bizayend in. Yanî hin cureyên peyvên wan dema di nava hevokê de tîbîkaranîn qertafên tewangê digirin, hîn jî ji koka xwe tîbîguhertin û di hin peyvên de zayenda derewîn diyar dibe. Vêca em niha berê xwe bidînin kî çî kurdî de zayenda peyvên çawa ye û bi çî diyar dibe. A- Di kurmancî de Tewang. Tewanga kurdî/kurmancî dibe du bir. Bira yekem. 1- Qertafên yekjimar û diyar/binavkirî. Ev cure qertaf ji sê beşan pêk tê. a- Tewanga «ê» yekjimar û mê/mêza ye. Mînak; Zîne xwîşka mîr Sêvdîn e. Wê sêvê neqêşêre. b- Tewanga «î» yekjimar û nêrza ye. Mînak; şivanî pez bir ber bêriyê. Mehemedî tiştê rast got. c- Tewanga «an» pirjimar û nêtar e, ango zayendê diyar nake. Mînak; Daran nebîrin. Hevalan ji we re silav şandin. 2- Qertafên yekjimar û nebinavkirî/nediyar. a- Tewanga yekjimar û mêza «ekê» ye. Mînak; Malekê bidin Şemîranê. Darekê di hewşa xwe de biçîne. b- Tewanga yekjimar û nêrza «ekî» ye. Mînak; Hespekî ji min re bîne. Kevîrekî li serê dijminê xwe bixe. Mamekî min ê jêhatî heye. c- Tewanga pirjimar nêtar «ine» ye. Mînak; Mirovine xemsar û bê eleqe ne. Diya min gûzine pûç da min. Pirtûkine nayên xwendin şandine.

B- Di kurdî/kurmancî de veqetandek. Di veqetandekan de jî zayend û mêjera peyvê diyar dibe. Veqetandek dibin du beş, veqetandekên binavkirî û yên nebinavkirî. 1- Veqetandekên binavkirî ji çend qertafan pêk tên. Ew jî ev in: «a», «ê» û «ên» in. a- Ji veqetandeka binavkirî «a» mêza, yekjimar û binavkirî ye, herwiha aîdiyetê jî diyar dike. Mînak; Kera mala meta min boz e. Eywana xwîşka min gelek rengîn e. b- Veqetandeka binavkirî «ê» nêrza, yekjimar û binavkirî ye. Mînak; Kerê

mala xalê min reş e. Xani(y)ê bira(y)ê min sê tebeq e. Di van herdu hevokên jor de tîpa «y» ketiye navbera navdêr û qertafa veqetandekê «ê» yê. Ji wê y>yê re jî tîpa kelijandinê tê gotin. Şivanê Ehmedê Robarî pez winda kiriye. c- Veqetandeka pirjimar ya binavkirî «- ên» nêtar e. Mînak; Kerên mala mamê te gewr in. Eywanên gundê me mezin in. Rojên xweş li pêşiya me ne.

2- Veqetandekên nebinavkirî «-ekî», «-eke» û «-inan» e. a- Veqetandeka nebinavkirî «-ekî» yekjimar, nêrza û nediyariyê nîşan dide. Mînak; Ciwanekî serê govendê girtibû. Delalekî strana Dewrêşê Evdî diştra. b- Veqetandeka nebinavkirî «-eke» yekjimar, mêza û nediyariyê nîşan dike. Mînak; Pêlaveke min heye. Dareke sêvan di hewşa me de heye. Hêlîneke çivîkan li ser darê ye. c- Veqetandeka nebinavkirî «-inan» pirjimar û nêtar e. Mînak; Ciwaninan govend digerlandin. Delalînan stran diştrîyan. Pêlavinan ji zarokan re bikire.

Mirov dikare van mînakên van zêdetir bike bes mebesta me li vir ne rêziman û hevoksazî ye. Tenê ez ê behsa cureyê tewanga navdêrên nêrza jî bikim û derbasî mijara xwe ya bingehîn bibim. Di kurmancî de navdêrên nêrza di nava xwe de jî ditewin. Heke tîpa dengdêr a dawî ya kêteyê bi tîpa a>yê biqede ew navdêr dikare di hundirê xwe de jî bê tewandin. Mînak; Şivan-î pez mêjand. Şivên pez mêjand. Ehmed ji welatî tê. Ehmed ji welêt tê.

Vêca ya esas ku ez dixwazim bêjim navên tişt û heyberên seredî, binerdî, deryayî û asîmanî yên xwezayî û çêkirî di kîjan astê de û bi çi pîvan û nîşanan zayendên nêrza û mêza ên derewîn tînan bikaranîn. Ji ber ku zimanê kurdî zimanekî xwezayî û çandinî ye û zimanê civaka herî pêşî ji nêçîrvanî û koçberiyê derbasî jiyana dêmanî û çandiniyê bûyiye, peyvên heyînên xwezayî serdest e. Weke nimûne navên gul û giya û tevahiya riwekan cara yekem proto-kurdan lê kirine. Herwiha

navê stêrk û tiştên din ên asmanî cara yekem ji hêla pêşiyên kurdan ve hatine lêkirin. Di wê serdemê de jî pêşengiya civakê ji hêla jinan ve dihat kirin. Lewre navlêkirina her tiştên xwezayî û yên bi afirîneriya mirovan dihatin çêkirin di destê jinan de bû.

Me berê jî gotibû ji ber ku jin zayînê pêk tîne pîroz e û weke jiyanê jî tê binavkirin. Jixwe me diyalektîka «Jîn û Jin» berfireh di mijara jinê de vekiribû û ji her hêlê ve dahurandibû. Dema jin weke jiyanê hatibe navlêkirin û pênasekirin û ew jî xwedyê rasteqîniyekê be bivê nevê wê ev taybetiya jinê xwe di ked û dahênanên (îcad) wê de jî bide der. Vêca hem tiştên xwezayî û hem jî yên ji hêla mirovan ve hatine çêkirin li gorî nazenînê, kêrhatin, zindîbûnê, xweşikati û girîngiya wan zayenda rêzimanî li wan hatiye barkirin. Ji bo baştir bê fêmkirin û gotinên me bên piştraştîkirin em ê li vir çend mînakên bidin. Navê çem û robaran ne têde hemû cure û şeweyên avan mêza ne. Li gorî veqetandekê mêzatiya van navan holê ye. Ava mezin. Coya avê. Gola Wanê. Deryaya Spî. Kaniya jor. Gera Mir Meheme. Quletêna avê. Şirşiroka gund. Dilopa mezin. Xwîsiya payîzê. Xunava hûrik. Sûlava Ava Spî . Kendava Besrayê. Li gorî tewangê jî mirov dikare wiha bibêje. Avê rê biriye. Coyê berde ser bîştan. Golê kerz girtiye. Deryayê xwe paşve kişandiye. Kaniyê şêlo neke. Gerê her tişt kişand nava xwe. Ji wê quletênê avek cemidî derdikeve. Mirov dikare hemûyan bi vî awayî di nava hevokê de bikar bîne. Bes pêdivî pê nîn e. Giya, pel, çiqil û qurm ne têde hemû cure gul û giya û riwek bi zayenda mêza ne.

Em çend mînakên bi tewang û veqetandekan tevlihev bidin. Kulîlka sor xweşik e. Gula dawidek pir rengîn e. Em ê vê nergizê biçînin. Ew pelgoşara lavlavokî ye. Sosinê bêhn bike. Beybûnê av bide. Dara hêjîrê hişk dibe. Kulîlka pîzpîzakê zer e. Xecxecoka min nazenîn e. Dara berûyê di hewşa me de ye. Ev koza hanê çêreyê pezê me yê zivîştanê

ye. Kulîlkên nefala me çar pel in. Pez gêndelê naxwin. Tirşoka kewan
pir xweş e hwd. Bîştan ne têde her cure erdên çandiniyê jî mêza ne.
Em çend mînakan ji wan jî bidin. Felat zeviya xwe kiriye genim. Ev
şova Ferhat e. Dehla gelî pir fêkiyan dide. Durîngeha me zer bûye.
Boştana mala xalê te şewitiye. Pirêzeyaya me bijûn e. Vê hemîngehê
neçêrîne xwediyê wê dê aciz bibe. Gulîştana şaredariyê heye û hwd.
Xiyar, gundor, kulindê mîr, qulindê şamî, girêtî, zebeş û tirozî ne têde
hemû berên bîştanan mêza ne. Mînak; Bacan, balîcan, qitik, şemamok,
bamî, îsot, reşat, fincik, werzik, polik, Şoqil, Fasûlî û hwd. tev mêza ne.
Navên hemû cure gund, bajar, herêm, parzemîn û şeweyên cih û warên
mirovên yên din tev mêza ne. Weke mînak; Cizîra Botan, Kurdistana
Bakûr, Herêma Biradostê, Taxa Cûdî, Kolana Azadiyê, parzemîna
Ewropayê, herêma Anatoliyayê. Navçeya Cizîrê girêdayî Şîrnexê ye.
Guhera mezin, Zomeya li qûntarê zinêr, Warê malên me û hwd.

Dîsa xanî û kon ne têde navê hemû cure avahî û ştargehan mêza ne.
Em çend mînakan ji van jî bidin. Mala dengbêjan, Çadirê bide koçeran,
Xîveta hêjaran, Şikeftê hildiweşînin, civat li mizgeftê nimêj dike, Dêra
Zehferanê mezin e, Pereştgeha oldaran, Mêvan li koçkê rûniştin, Birca
Belek, Haham li kenîştêyê dimîne, Gova bizinan, Çêlekan têxe axurê,
Eywana civînê, Mezela razanê, Êgir li tifikê pê dixê, Embara genimî,
Bavo li ber dikanê ye, Kozikê ji berxan re çêdike, Hevşiyê bizin, Sênca
daran, Kayê tavêjin kadînê, Pêşgeha malê, Aşxaneyaya karxaneyê, Zarok
diçin dibîştanê, Keça min li zanîngehê dixwîne, Jêrzmîna hişê min
nexişandiye. Wekî li jor jî tê dîtin peyv û hevokên ku me nivîsandin
hemû bi veqetandeka binavkirî “a” û bi qertafa tewangê ya binavkirî
“ê” ku herdu jî mîzatiyê nîşan didin girtine. Dema mirov bi awayek
baldarî berê xwe dide peyvên ku zayenda wan mêza ne mirov dê bibîne
zimanê kurdî çi qas di bin bandora xwezayî û çandinî de ye. Herwiha

mirov dê pêrozwerî û girîngiya dayîkê/jinê jî di nava van peyvên de bibîne.

Peyva xweza bi xwe peyveke mê ye. Lewre piraniya tiştên xwezayî jî mêza ne. Ew hebûn û tekberên nazenînî, xweşikati, delalî û jîndariyê raberî mirov dikin piraniya wan mêza ne. Heta hin peyvên weke evîn, hezkirin, bêrîkirin, bawerkirin, hîskirin û hwd. ên razber û sedema domandina jiyanê ne hemû mêza ne. Ji ber ku zimanê kurdî zimanekî di destpêka civakîbûnê de hatiye honandin û afirandin û di serdema dayîksalarî de pêş ketiye û çavkaniya xwe ji xwezayê wergirtiye, hemû taybetmendî û nîşanên wê serdemê di hundirê xwe de hewandiye, paraştîye û heta roja îro aniye. Ew jî xwezayîti, jînbarî û bandora jinê ya teqez e. Li gel ku zimanê kurdî bihezaran salan bêxwedî, bêxwendin û bênivîsandin maye jî û li rastî gelek pêkutî û bişaftinan jî hatiye ji ber vê taybetiya xwe kariye heta roja îro li ser piya û jîndar bimîne. Lewre her çi qas zimanê kurdî li bajaran heta aştê helayî be jî, li gund û çiyayan weke kargeh û parêzgeha xwe li ser koka xwe vejandiye û taybetmendî û hebûna xwe paraştîye.

Zimanê kurdî ew qas hatiye paraştin heta kurdan jê re gotine «zimanê zikmakî». Yanî di zikê dayîkê de jî hatiye hînbûn û pêşvebirin. Ji ber van sedem û taybetmendiyên dayîksalarî û xwezayî bandora jinê serdest bûye û xweşikati û jîndarî bi mêzatiyê hatine destnîşankirin. Di esasê xwe de ev nîşaneyên ked û pêşengtiya jinê ye. Zimanê kurdî ne zimanekî li ser maseyan û bi biryar û fermanan hatiye çêkirin e. Ew zimanekî herî kêr xwediyê 12 hezar salan raborî û dîroka civakîbûnê ye. Di her kêliya jiyanê de, di her dahênan (îcad) û afirîneriyê de xwedî nîşanekê ye. Hemû şariştanî û serdeman ji çand û zimanê gelê Kurd sîd wergirtiye. Navlêkirin û pênasekirina zimanên Arî û Hînd-Ewropî ji vê çand û zimanî û ji vê erdnîgariyê belaveyî cîhanê bûye.

-FONÊM DI ZIMANÊ KURDÎ DE (KURMANCÎ û SORANÎ)

■ Berzo Mehmûd

- Birr I Fonêm di Zimanê Kurdî de**
- Birr II Fonêmên Kurdnijad**
- Birr III Dîftong (diphtong)**
- Birr IV Şêwedeng (allophone – elofon) di Zimanê Kurdî de**
- Birr V Zirrdeng di Zimanê Kurdî de**
- Birr VI Diyardeya dengên Arabî**
- Birr VII Dengên (ĥ, ĝ, <)/(ح Ğ ع) Zirrdeng in, Yan Zirrfonêm in?**
- Birr VIII Giriftarî Navbera Wergirtina Peyvên Arabî û Peyvên Ewropî**

Birr I

Fonêma di Zimanê Kurdî de (Kurmançî û Soranî)

I. Fonêma di Zimanê Kurdî de

Ta niha ez pêrgî jêderêkî wa têrûtesel nehatime ku derbarî hemû aliyên dengên zimanê kurdî bide ber xwe. Ez vê yekê dibêjim û belkî ez bi xwe jî nikarim vî alî têr bikim, ji ber ku lêkolîn di vî warî de berî her tiştî pêwîstî bi amêrên dengsaziyê heye ku giriftariyên deng bi riya teknoloji werin çareserkerin, yan jî wê dîsa kêma bê wek vî berhemê nav destê we de, sedema dîtir jî ew e gelek kêşeyên aloz û bîrûrayên ciyawaz derbarî dengên zimanê Kurdî hene, nemaze di barê dengên diyalektên Kurdî de. Kêşeya jimarên dengên - wek Dr. Ewrehman Hacî Marîf daye xuyakirin- (di hin rêzimanên kevin de ne wek hevîn, bo nimûne dengên vawel li nik F. Yûstî (F. Justî) û S. Yegîzarof nêzîkî (15) a ye, lê li nik E. B. Soan û R. F. Jardine (10) in. Dr. Hacî Marîf di nivîsara xwe de hin raştîyan diyar dikê dema ku dibêjê: (danana Alfebêya Latînî li sala 1929 bo Kurdên Sovêta û li sala 1930 – 1931 bo Kurdên Sûriya, gaveke mezin bû di xuyakirina dengên vawel û consonant) de. Alfebêya Kurdî Ermenîstanê li ser bîngeha Alfebêya Latînî hatibû danîn, ya ku bo nivîsîna zimanê kêmatiyên Welatê Sovêta hatibû danîn. Alfebêya Kurdên Sûriya jî li ser bîngeha Alfebêya Latînî – Tirkî hatibû danîn. Jimara tîpên vawel di wan herdû Alfebêyan me anîn ziman yek in, ku (8) in. Lê jimara tîpên kosonant di wan herdû Alfebêyan de ne yek in: di ya Kurdî Sûriya de 25 tîp in, û di ya Kurdî Sovêta de 30 in. Ev ciyawazî, wek Dr. Ewrehman şîrove dikê, ne encama cudabûna diyalekta ye, ji ber ku herdû zar ji yek diyalektê ne, lêbelê ciyawazî

her ew e ku hin deng di Alfebêya Kurdên Sûriya de wek fonêm nehatin jimartin. Dr. Ewrehmanî nedaye xuyakirin ka danerê vê Alfebêyê kî ye, tenê jêre dibêjê Alfebêya Kurdên Sûriyê, gelo ev alfebê ya Celadete yan ya mirovekî dîtir e, nizanîm!!?

V. S. Sokolova di pertûka xwe de ya ku derbarî zimanên Îranî nivîsiye, bi şeweyekî rast û zaniştî li ser fonetîka diyalekta Kurdên Xurasanê ştexilîye, û 9 deng bo vawel daniye, û 30 deng bo konsonant destnîşan kiriye. Di vî barî de Qenatê Kurdo û Çerkezê Beko jî (9) dengên vawel, û (30) dengên konsonant. Lê Kerîmê Eyûbî û A Simîrnûva bo vawel (11) deng, û bo konsonant (26) deng. Li nik D. N. Mekenzî (8) deng bo vawel di zarê Kurmancî de, belê (9) deng bo vawel di zarê Soranî de. Di sala 1932 li Şamê Herekol Azîzan (Celadet Bedirxan) di bin navê ((Rêzimana Elifbêya Kurdî) namêlkeke bîst rûpelî bi pênc zimana (Kurdî, Fransî, Turkî, Arabî, Farisî) belav kiriye, têde 8 deng bo vawel, û 23 deng bo Konsonant daniye. Celadet «Alî Bedirxan di sala 1953 pertûkek di rêzimana Kurdî de belav kiriye. Di sala 1970 de li ser bigeha vê pertûkê Rojê Lîsko bi awakî feretir bi navê xwe û navê Celadet Bedirxan pertûkek di rêzimana Kurmancî de belav kir.

Bo em vê yekê dûdirêj nekin, emê cedwelekê bi navê daner û jimara dengan, vawel û consonant, li jêr danin, ew jî ev in:

V C	Consonant	vawel	Pertûkên Rêzimana Kurdî
	15	F. Justî û S. Yegîzarof	
	10	E. B. Soan û R. F. Jardine	
38	30	8	Alfebêya Kurdê Ermenîstanê 1929
33	25	8	Alfebêya Kurdên Sûriya 1930 – 1931

39	30	9	V. S. Sokolova			
39	30	9	Qenatî Kurdo û Çerkezê Beko			
37	26	11	Kerîmê Eyûbî û Asimîrnûva			
	8		D. N. Mekenzî			
D. N. Mekenzî		9				
Celadet <Alî Bedirxan 1932	8	23	31			
Celadet <Alî Bedirxan 1953	8					
Rojê Lîsko û Celadet <Alî Bedirxan 1970	8	23	31			
Reşîdê Kurd 1956	8	23	31			
Tewfîq Wehbî	8	25	33			
Nûrî Elî Emîn	12	32	40			
Tahir Sadiq	6	28	34			
M. Emîn Hewremanî	8	27	35			
Mesûd Mihemed	8					

II Fonêmên Zarê Kurmancî

Fonêmên zimanê Kurdî dibine du nîş: dengdêr û dengdar (consonants and vowels). Zimanê Kurdî bi alîkariya van herdû nîşên dangan: vawel /dengdêr û consonant/dengdar drûst dibê, û bêje û peyv wusa şeweyê xwe diştênin û her yek ji wan wateyekî taybetî didê. Bo vê yekê me du lîste ji peyvên Kurdî, ligor hatina her dengêkî yan her tîpekê danîne, ew jî ev in:

1-Dengên Konsonant/dengdar (consonants)

Dengdar ew fonêm in, yan ew deng in, ku hewa ji qirîkê ta di dev û bêhvilê re derbikevê, û pêrgî hin organên dibê, ku her ev jî şeweyekî taybetî ji deng derdixê, bo nimûne, dengê (m) û (p) bi riya organa lêvê

druşt dibê, û wilo jî dengên ziman yên dîtir.... htd.

Di Alfebêya Kurdî de, û ligor ku îroroj kar pê tê kirin (23) dengdar hene, wek ku Celadet Bedirxan destnîşan kiriye. Eva han jî gelekî nêzîkaiyê li raştiya sîstima dengsaziya zimanê Kurdî dikê, bi ser ku eva han li Kurdisatanê bi şêweyekî hindik yan gelek tê guhartin, nemaze li nik Kurdên Iraqê, ji alîkî ve, û li nik Qenatê Kurdo ji alîkî din ve. Lê eger cotepeyvên zimanê Kurdî danin ber hev emê wa bibînin ku fonêmên dendar ligor cotepeyvyan jimara wan digihê 27 fonêman, herçende ku sê fonêmên (*h, g, <*) / (*ç, ê, ç*) bi hindikayî di zimanê Kurdî de bikar tên. Inca bûna van hersêkan di Kurdî de cihê biryardaneke giştî ye, çî wan jî nav fonêmên Kurdî bijimêrin, yan jî wan ji Kurdî dûrbikin. fonêmên Kurdî ev in:

Cotepeyv (minimal pair)

Li ser destûra cotepeyv (minimal pair), emê dikarin fonêman di zimanê Kurdî de destnîşan bikin, ku ev jî di riya bermberkirina her du peyvyan, yan her çend peyv, ku her peyvek ji wan wateyeke xweyî taybet didê, lewre jî dengên peyvê di rêzkirineke sîstîmdar de diyar dibin û wate didin, fonêm li ser du beşan parve dibin: konsonant û vawel:

1. Fonêmên Konsonant di Kurdî de:

/p/ par

/b/ bar

/t/ tar

/d/ dar

/k/ ker

/g/ ger

/ç/ çar

/c/ car

/f/ firr

/v/ virr

/s/ sar

/z/ zar

/ş/ şar

/j/ jar

/m/ mar

/n/ nar

/l/ al

/r/ ar

/r/ vir, fir

/rr/ virr, firr

/x/ xar

/xx/ ĝ/ ĝar

/y/ yar

/w/ war

/h/ har

/q/ qor kor

Cotepeyv	Deng	fonêmên Kurmancî		jimar
bar	Par	b	p	2
car	çar	c	ç	2
sar	zar	s	z	2
dar	Tar	d	t	2
Jar	Şar	j	ş	2
mar	Nar	m	n	2
mar	Mal	r	l	2
kor	gor	k	g	2
vir	fîr	v	f	2
virr	Wirr	W		1
birîn	Birîn	Î		1
yar	War	Y		1
yar	Har	H		1
xar	Êar	ê	ع x ê	2
kor	Qor	Q		1
(hêft)(hêrrî)		ç		
(<ewr) (<enirî)		ع		25

Têbînî

Di vir de me hin deng nexistîn nav fonêman wek طعحضصط û dengê (k) ya sert û (l)a qelew bi ser ku (l) û (r)a qelew di zarê Soranî de du fonêm in. dibeşên bê de emê li ser van dengan rawestîn.

2. Dengên vawel(vowels) di Kurdî de

Dengdêr yan vawel ew fonêm in, ya ew deng in ku hewa wusa ji dev û qirikê derdikevê bê ku endamek ji dev di riya wê hewayê de rawestê,

û ligel dengdaran peyvên ziman ava dîkin. Ji van dengan re (vowel = dengdêr = **صان**) dibêjin, ew jî heşt in: a, e, u, î, o, ê, û, î

Dengdêr ji alî dengdirêjîyê ve du celeb in:

1. Dengdêrên dengkurt ku sisê ne: (e, î, u)
2. Dengdêrên dengdirêj ku pênc in: (a, ê, î, o, û)

Di sîstîma ziman de peyv yan bêje nikarê li ser bingeha dengdêran tenê xwe ava bikê, pêwîstî bi dengdaran heye jibo ku peyv û rişte û gotin bi şeweyekî drûst pêkwerê. Inca fonêmên dengdêr di zimanê Kurdî de ligor cotepeyvên Kurdî ev in:

cotepeyvên Kurdî	fonêm
(dar, dêr); (zar, zêr); (kal, kêl); (şêr, şar)	a, ê
(kîl, kil); (şîr, şir); (bîr, bir); (pîr, pir)	î, i
(der, dar); (zer, zar); (kel, kal); (şer, şîr);	e
(kun, kon); (gur, gor); (kuç, koç); (kur, kor)	u, o
(dûr, dor); (kûr, kur); (tûr, tor); (dor, dûr)	û

Dengdêr	Peyv
A a	dar, zar, kal, şar, gar, çak, jar, bar, ban, par
Ê ê	dêr, zêr, kêl, şêr, gêr, çek, jêr, bêr, bên, pêr
Î î	dîrok, zîrek, kîl, şîr, gîr, çîk, jîr, bîr, bîn, pîr
I i	diran, zirç, kil, şir, gir, çik, jin, bira, bin, pir
E e	der, zer, kel, şer, ger, çek, jen, ber, ben, per
U u	dur, zurne, kul, kun, gur, kuç, kund, kur,
Û û	dûr, zû, kûr, şûr, hûr, çûk, tûr, bûk, bûn rût
O o	dor, zor, kol, şor, gor, çok, tor, bor, bo, por

Bi vî awayî fonêmên her zimanekî têne jimartin û diyarkirin. Lê ew fonêma ku wateyeke nû didê, nikarê bi tena xwe, ango dervî rîstika peyvê, wateyekê bidê, Lewre dibê wek tişteki rûten (abstract مجرد). Vêca rêzkirina fonêman di rêkxistîneke taybetî de kêtekê yan jî, carna, morfemekî druşt dikê, bo nimûne, peyva (koledar) ji heft fonêman pêktê: (k + o + l + e + d + a + r), û ji sê kîtan: (ko + le + dar), lêbelê ji dû morfêman (kole + dar) druşt dibê.

III. Fonêm di Zarê Soranî de

zarê Soranî de heman fonêmên Kurmancî bikar tên, lê ciyawazî di hebûna pênc fonêmên zêdetirî Kurmancî heye ku ew jî dengê fonêma /l/ a stûr e, û dengê (hemze) ku tîpek jêre heye, û hersê dengên ($\hat{h}$ $\hat{g}$ $\hat{c}$) yên ku ta niha yekdengî li ser çênebûye. Lê eger em ligor Alfebêya Celadet hesab bikin şeş tîpên dîtir ji me re divîn jiber ku jimara tîpan li nik Celadet digihê (31), lê li nik zarê Soranî digihê (34)an.

alif û bêî zimanî kurdî birîtîn le :

a, b, p, t, c, ç, H, x, d, r, rr, z, j, s, ş, Y, Q, f, w, q, k, g, l, ll, m, n, w, h, y.
em nîşanane-y jêrewe bizuên in:

\a\ wek: bar, dar, naz.

\e\ le cêgey fethey YArebî ya zeberî farsî dekar dekirî, wek: ser, merd, bere, were, werwere.

\u\ le cêgey zemmey YArebî û pîsî farsî dekar dekirî, wek: kurd, xurd, şut, kutan, kutin.

\û\ bêjî (telefuz) dirêjî heye, wek: dûr, pûr, sûr, kûrr, sûk, tûtin, cût.

\o\ bêjî billawî heye, wek: zor, xor, şor, pol, kok, nok.

\i\ le cêgey kesrey YArebî û zîrî farsî degirêtewe, wek:

hisab, kitab, nîsane.

têbini: le kurdi da waje-i kesredar bedegmen deşt dekewî, her leber ew e bo bîjî dirêjî \lîş her lew nîşane kelk werdegirîn, wek: zîn, cîn, sîr, pîwaz, dîwar.

\ê\ bêjî billawî heye, wek:

dêw, zêw, nêw, pirêjin, cinêw, dê, rê.

çend xallî girîng

1) nîşaney \rr\, \ll\ bêjî billawî heyen, wek:

goll, dill, sill, dir, kir, kirryar, bazarr.

2) \rr\ le seretay wajekanî kurdî da hemîşe qellew e û bêjî billawî

heye û her bewhoyeşewe nîşanekey bo dananên, wek:

reben, reHmet, reng, rewe, rewan.

3) pîtî muşedded dûpat dekeynewe , wek:

mîllet, Yîllet, gulle, zille, hîmmet.

têbini:

Zimanî kurdî wajey muşeddedî zor keme û zurbey am core wajane YArebîn ke zebanî kurdî taybetmendî xoy beser zurbeyan da dasepanduwe û bêjekeyanî xaw kirdotewe, birrwane aw nimûne aşkirayane-i jêrewe:

(Arebî) kurdî

(Yzzt) = Yêzet

(Yzzalddîn) = Yêzedîn

(mnnt) = minet

(mHîalddîn) = miHedîn

(mHmmd) = Hemed, Heme

(drrh) = dere

4) Bedaxewe hêndê kes êştas pîtî YArebî de nûsînî kurdi da de kar dênin û biyanûyan aweye ke manay naw degorri. pîwîşte bigutrê ke hîçkes le hîç jêgey dinya da wextêk yekêkêk bang deka ya naw deba serinc nadate manay nawekey. yanî ta bangî kird selîm (slîm) lewe nakollêtewe ke am nawe le (slm) (slamt)î YArebî wergîrawe ya eger guti sedîq (sdîq) fikrî bo ewe naçê ke em waje ye le (sdaq t û sdq)î YArebî gîrawe. her wek de zimanî îngîlîyî da

gutman «johnson» fikr lewe nakeynewe ke em nawe le dû besî «John» yanî yeHya û «son» yanî kurr pêk hatuwe û manay naweke debête (kurrî yeHya).

5) baştir ewe ye ayatî qurrânî pîroz û Hedîs û fermayîşatî gewre pîawanî mezhebî be YArebî lenêw perrantêz da binûsirê û manakey be kurdî lêk bideynewe.

6) pîtî (w) zortir le kurdî şîmal da le cêgey (w)î kurdî naweraşt da dekar dekirê. le kurdi naweraşt da tenya dû sê wajeman heye ke em pîteyan têdabê., wek biwe, giwe.

ئەلفبەیی کوردی: 34 تیب

ئ ا ب پ ت ج چ ح خ د ر پ ز ژ س ش ع غ ف آ ق ک گ ل ل م ن م ه و و و ی ئ

پیتە بزۆینهکان:

ا ه و و و ی ئ

پیتە نه‌بزۆینهکان:

ئ ا ب پ ت ج چ ح خ د ر پ ز ژ س ش ع غ ف آ ق ک گ ل ل م ن م ه و ی

Birr II

Fonêmên Kurdnijad

Fonêm di zimanê Kurdî de ji aliyê nijadî ve dibin du nîş:

1. fonêmên Kurdnijad:

2. Zirrfonêm çar in, wek: (q, g, h, <)

1. Fonêmên Kurdnijad:

Ji wan fonêmên re Kurdnijad dibêjin ewên ku ji kevin de di zimanê Kurdî de hene, ku yê wawel heşt in / a o u û e ê i î /, lê yê konsonant di vê cedwela xawrê de:

Consonant Lerînsazî dulêvî zimankî

apical esmankî nermela zimanokekî ewikî

kospek

Occlusives Kip p t c k Q

Girr b d j g

xişok

fricative Kip f s sh x h

Girr v z jh

Bêvilok Girr m n ng

Layî Girr l ll

flap Girr r

Trill givok Girr rr

Rewan Girr w y

Dengên / ll/ û / R r /

Du dengên stûr di Kurdî de hene, yek jê /ll/ e, ya dîtir / r / e, ku her yek ji wan di zarê Soranî de wek du fonêman têne jimartin, û jiber wilo jî bûne wek du tîpên ciyawaz ku bi danîna nîşanekê li ser (r) û (l) têne cudakirin. Ev (r) û (ll) hinekî ji yên dîtir têvelin, ango hinekî bi ser şêweyêfonêm de diçin, nemaze, dengê (r). Lê belê dengê (ll) di herdû zarên Soranî û kurmancî de bi şêweyekî drust û tewaw cihê fonêm nagirê, lewre ez wa rast nabînim ku em wek fonêm bi dengê /ll/ bigirin.

1. Dengê /r/

Dengê /r/ bi xwe fonêmek e, lê ev deng di hin peyvan de stûr dibê yan qelew dibê (الراء المفخمة), û ev stûrbûn yan qelewbûn guhartinekê jî di wate peyvê de bi xwere tîpê, wek van herdû peyvên (birîn) û (birrîn) - ku dengê /r/ a stûr bi du (rr) a hatiye nivîsîn – wa ciyawaziyekê di wate de navbera herdû peyvan de diyar e, û eva han jî di van herdû rîsteyan de xuyanî dikê, wek:

birîn: Birîna dilê min kûre. جرح

birrîn: Birrîna daran erdê zuwa dikê. قطع

bir: Min pertûka xwe bir. أخذ

birr: Îro min birrek zilam dît. مجموعة

zirav: Bejina vê keçikê zirav e

zirrav: Zirravê min tîşê

gir: Mala me li serê gir e

girr: Girrê xwe pê dixwerênê

Jiber vê yekê jî ka gelo em vê /r/a stûr bêxin ber fonêm de, yan ne? Ez wa dibînim ku dengê /r/ stûr bi ser fonêm de diçe, jiber ku wate pê tê guhartin, û peyvên ferhengî hewqa têra xwe hene, ku barê fonêm hilgirin, jibîlî ku di zarê Soranî de belkî pirtir diyar dibê, lewre ez bi xwe pêşniyar dikim ku di nivîsînê de dengê /r/a stûr bi du (rr) bê nivîsîn, bo ku ciyawazî di girafîma tîpan de jî bête xuyakirin, wilo giriftarî çareser dibê. Hêjayî gotinê ye ku Celadet Bedirxan dengê /r/a stûr wek fonêm nedaniye. Di baweriya min de nefonêmkirina /r/a stûr ne drûst e, jiber ku gelek peyv di zimanê Kurdî de hene bi /r/a stûr tene naskirin, wek: *Î* *î*, *birîn*, *keî*, *guî*, *bîrek*, *gir* di vancotepeyvyan de, wek:

<i>girr</i>	<i>gir</i>
<i>gurr</i>	<i>gur</i>
<i>birrîn</i>	<i>birîn</i>
<i>wirr</i>	<i>wir</i>
<i>birrek</i>	<i>birek</i>

Lewre, pêwîst e ku tîpeke taybet bi vê fonêmê hebê. Piştî ez li nav sîmobilên kompyûter geriyam, min sê sîmbol jibo dengê /r/a stûr dîtin, ew jî ev in:

Î *î* *Ṛ* *ṛ* *Ř* *ř*

Ji nav hersê sîmbolan min wêneya pêşî *Î* *î* hilbijart wek pêşniyar. Pêşniyareke dîtir jî heye ku di şeweyê rênivîsê de du (r) ên bidû hev de dikarin dengê /rr/a stûr bidin, û ev jî ji ya berê hesanîtir e, wek: *wirr*, *birrîn*, *kerr*, *gurr*, *birrek*, *girr*

2. Dengê /ll/

Dengê / ll / jî wek yê / r / di hin peyvên de li nik hin zarên Kurdî, bi taybetî, yên Soranî, qelew dibê, ku ev bi xwe li nik zarê Kurmancî bi piraniya zarê soranî peyda nabê. Yan jî eger hebê guhartina wate têde gelek kême, wek dengê /l/ di (guhbel) de tenik e, lê di (çavbell) de qelew e. Ji ber wilo jî ez pêwîst nabînim ku tîpeke dîtir, yan ciyawaziyek navbera herdû dengên /l/ê: ya qelew û ya nerm hebê. Ya dîtir jî dengê / ll/a qelew û ya nerm ew wateyên nû yên gelek nadê, tenê hin peyv bi teliyên dest têne jimartin, wek:

	nerm	sirt		
40	çil	çil (ççill)	berçemk	خفافاش
	bel	bell		

Lewre ev qelewbûn nakevê ber pêkhatina fonêmekî nû de, ku her ev dengê qelew wek elofon tê, bo nimûne: peyva (dill) çî bi (ll)a qelew û çî bi ya nerm her yek wate didê. Weha jî peyvên xîstexana jêr de dengê /l/ navbera herdû zaran de ne wek heve, lê ti guhartin nakevê wate de, wek:

Kurmancî Soranî

(l)a asayî (l)a qelew: (ll)

gul gull

bel bell

mal mall

heval hevall

tal tall

Lewre jî, di baweriya min de, û wek nerîneke seretayî ango serpêyî, wa diyar dibê ku (Il)a qelew ji fonêmkî bikevê. Belê dîsa ez dibînim ku eva han pêwîstî bi lêkolîneke kûrtir û feretir heye, da ku lêkol bigehê encamên tekûztir.

1. Dengê [q]

Herçende hin wa dibêjin ku dengê [q] ji mêj ve di zimanê Kurdî de heye, ez bi xwe ji vê yekê ne bawermendim, û weha dibînim ku dengê [q] ne dengê resen e, ango ne dengê nijadkurd e, Lewre jî min ew xîstiyê nav zirrfonêman de, lê ev deng ji hersêkên dîtir başqeye û cihekî xwe di zimanê meyî îro de girtiye, û bihayê wî jî wek bihayê kurdfonêman dîtire, wek b, p, t, k... htd. Lê bi ser wilo de jî nabê em wê raştîyê pişt guh bixin û nebêjin ku piraniya peyvên qafdar - ango ew peyvên dengê [q] di wan heye, çî di despêka wan gotinan de bê, û çî jî di dawî û navîka wan de bê - gelek ji van peyvên ji zimanê Arabîne, yan jî ji zimanê Tirkîne. Eva han jî di ferhenga Kurdî de diyare, wek van nimûneyê jêrî ku me ji ferhenga Hemîdiyê wergirtine, wek :

Arabî wate bi kurdî peyvên TirkîWate

QubletBaşûr	qapî	Derî
Qefes	qapqap	
qalûqîl	qapût	
Qam	qîz	
Qanûn Yasa	qereç	
qebûlbûn	Pejirandin	qaz
qehherîn	qalindSt	
Qeda	qamîş	

Qetran qamçî
 qedandin buwartin, derbaskirin qantir
 qur>e qayîş parçekî çerme pê xencerê girê didin
 qarîş parçekî çerme li noqa xwe girê didin

Peyvên Kurdî :

qafik qeşartin
 qarqarok qaşil
 qalib qalik
 qelen qarçik
 qaqreş qayim
 qêrîn qeba tişteki giran û hêja
 qajik qebale
 qayil qebilîn
 qawît quraftin
 qewîtî qerpal
 qutik qirçmandin qurçmandin
 qetandin qurçmîn
 qetek qerax
 qerisandin
 qerifîn

Lê Tirkîbûn û Arabbûna van peyvan nebûye sedemeke pir mezin ku ev deng peyvên nû jî drûst bikê, herwekî ketiye nav mîkanîzîma zimanê Kurdî de, lewre wê peyvên hebin jî ku ti pêwendî bi zimanê Tirkî û Arabî ve nîne, wek:

Eger em li ferhenga Kurdî ya (Alhediye Alhhemîdiye) binerin, emê bibînin ku daner gelek peyvên îro bikar nayên tomar kirine, yan jî wek van peyvên li deverêke taybetî bikartên yan jî li nik hin mirovên ku têkiliyê wan bi Tirkan re gelek hene. Ya dîtir jî li şûna van peyvên biyanî peyvên Kurdî hene, lewre gerek em bêje û peyvên xweyên resen bikar bênin, wek:

qapî derî, dergeh

qap berg

qalind stûr

li ber dengê /k/ yê ku birmakê hev in, ango nêzîkî hev in di derûya deng de ku ev jî di peregrafa jêrîn de tê şîrovekirin.

Dengê [k] yan [q]

Hincar dengên peyvên di zimanê meyî îro de bi du coran tene gotin, wek dengê [q] û dengê [k] di hin peyvên de cihê hev digirin. Di baweriya min de, bilêvkirina dengê [k] di zimanê Kurdî de ji yê [q] kevintir û resantir e, jibîlî ku dengê [k] ji yê [q] xweştir û nazktir e. Ev diyardeya han encama kartêkirina zimanên biyanî ye, nemaze, yê Arabî û Tirkî, ku ev peyvên jêrî wek nimûne vê yeka han pêş me dikan, wek:

qeliştin	keliştin	xelq	xelk
peqandin	pekandin	qop	kop, kupiyayî
çiqil	çikil	qiç	kiç, keç
pijiqandin	pijikandin	qirç	kirç
qezwan	kezwan	qîz	kenîz, keç, kîjol
qelişîn	kelişîn		

Lê, gelo em kîjan dengî [k] yan [q] hilbijêrin, eva han ne hewqas bi kêfa me ye, ango piroseya pêşveçûna ziman bi şêweyê raşteqîne di jiyane de xwe li ser me disepênê. Belê di hin peyvên de dengê [k] pirtir bikar tê, lewre gerek bi kêmanî peyvên wilo bi dengê [k] bêne çespanandin, nemaze dengê [k] ji yê [q] di Kurdî de kevintir û resantir e.

Dengê (hemze)

Dengê ((hemze)) bi xwe ew deng e ku pirtir di seretaya dengdêr de tê, yan jî em dikarin bêjin ku despêkirin bi dengdêr (vawel) pêwîstî bi diyarbûna (hemze) heye, ango di piroseya despêkirina bilêvkirina dengdêr de, (hemze) di seretaya dengdêr de diyar dibê, lê (hemze) wek şêwe û tîp di Alfebêya Kurmanciya Latînî de nîne, belê di tîpnivîsa Arabî de heye, wek: (أ ء إ ؤ). Herwerha dengê ((hemze)) wek tîp di zarê Soranî de diyar dibê, nemaze ku tîpên Arabî rê didin şêweyekî weha derkevê, wek (أ/ه). Hin zimanzan dengê (hemze) wek fonem dibînin. û hin jî wek deng û fonem lê meze dîkin, lewre ti şewetîp jêre nabînin.

Cihê (hemze) di peyvê de pirtir di sereta de ye, lê hincar peyvî hene wek (ne>) ku (hemze) di dawî de tê. Lê wekî dîtir (hemze) di seretaya peyvê de diyar dibê, wek:

Kurdîya latînî tîpnivîsa Arabî

ez	هـ ذ
ûr	ئوور
êvar	ئيفار
agir	ئاگر
axaftin	ئاخافتن
ajotin	ئاژوتن

Di zimanê Kurdî de hin kar hene, ku bi dengdêr des pê dikin, û wek em dizanin di seretaya wan dengdêran de (hemze) diyar dibê, wek: axaftin, ajotin, anîn, êşan... htd. Di piroseya gerdankirinê de «kar» çend pêşrêsan werdigirê, wek (di-) û (bi-) û (ne-) û (na-). Inca di xeleka hevgihaştina dawiya pêşrêse de ku dengê (i)ye ligel dengdêrê despêka regê kar (-a) yan (-ê) yan (-î) tê, ku du dengdêr digihin hev, wek em dizanin, herdu li hev nakin, di vir de du çare hene:

1. Jibo (hemze) bê xwendin, şextek (dash) bikevê navbera herdu dengdêran de wek: (di-axêvim), bi vî awayî dengê (a)ya (-axêvim) ji sereta ve tê xwendin.
2. Jibo (hemze) neyê xwendin: Lê eger em şextê nedanin, wa pêwîst e ku dengdêrek dengdêrekî bixwê, yek yekî dixwê, nemaze yê dirêj yê kurt dihilênê, lewre bi vî awayî diyar dibê, wek:

Erênî:

jêder rêjeya nihokê rêjeya ferman
tê xwendin

di- reg	nayê xwendin	bi- reg	
axaftin	di-axêvim	Taxêvim	baxêve
ajotin	di-ajom	Tajom	bajo
êşan	di-êşim	Têşim	bêşe
hanîn	dihênim	Tênim	bihêne
anîn	di-ênim	tênim, tînim	bihêne / bêne
hênan	dihênim	Tênim	bihêne / bêne

Nerênî:

rêjeya erênî rêjeya nerênî
 di- reg t ni/ne/na- reg
 di-axêvim taxêvim naxêvim, ne-axêve
 di-ajom tajom najom, nejo,
 di-êşim têşim Nayêşe
 dihênim tênim Bihêne
 di-ênim
 tênim
 tînim nayênim, na-ênim, ne-êne

Dengê (hemze) li dawîya peyvê

Wek diyar e dengê (hemze) di zimanê Kurdî de di seretaya peyvê de tê, ango di navîk û di dawîya peyvê de diyar nabê, lê eger wa hat ku peyveke biyanî, nemaze yên Arabî dawî bi dengê (hemze) bû, ev deng nayê bilêvkirin, wek peyva (قضاء) û (بلاء)a Arabî di Kurdî de bûye (qeda) û (bela) ku ti (hemze) nîne.

(hemze) dibê (ع)

Di hin peyvên Kurdî de dengê (hemze) dibê (ع) wek: (asman) dibe
 <esman عه سمان

asman عه سمان <esman

qur-an قورعان qur>an

ûr ئوور عوور ئوور

Aferîn عافرين <aferîn

Birr III**Şêwedeng (allophone – elofon)****di Zimanê Kurdî de**

fon1	dengê normal	dengê stûr	fon2
p	par behr	par	par sala çûyî p̥p̥ p̄ar
k	kar îşkar	kar	çîlîka bizinê k̥ k̄ar
l	dil Dil	ll	dił
r	bir stand	birr	parçek rîr bir̄
t	tarî Tarî	tt̤	tar̤î
s	sor Sor	ş	şor
z	zor Zor	z̤/z̄/ z̤	zor
h	horî Horî	h̥h̥	hor̥î
x	xerîb Xerîb	g̤	ger̤îb

Di zimanewanî de û nemaze di dengsaziyê de hin têge hene pêwîstî bi naskirin û ravekirinê heye ku bikarin bigihin mebesta lêkolînê. Inca têrimên dengsazî wek fon (phone) ango deng yan hevaldeng (allophone) û (fonêm- phoneme) pêwîstî bi pênasêkirinê hene. Li gor lêkolînên Ingilîzî pêname weha tên: (In phonetics, an allophone is one of several similar phones that belong to the same phoneme) . (A phone is a sound that has a definite shape as a sound wave, while a phoneme is a basic group of sounds that can distinguish words (i.e. changing one phoneme in a word can produce another word); speakers of a particular language perceive a phoneme as a single distinctive sound in that language. Thus an allophone is a phone considered as a member of one phoneme). Each allophone is used in a specific phonetic context and many times there is some sort of phonological process. Not all phonemes have significantly

different allophones, but there are always minor differences in articulation from one piece of speech to the next. For example, [p^h] as in pin and [p] as in cap are allophones for the phoneme /p/ in the English language because they occur in complementary distribution. English speakers generally treat these as the same sound, but they are different. The latter is unaspirated (plain): if plain [p] is also found in words such as the second p in paper [p^heɪ.pə] or spin [spɪn]. Outside of contexts that plain p appears in English, speakers may hear it as b since English b is typically unaspirated. Similarly, English-speaking people may become aware of the difference between two allophones of the phoneme t when they consider the pronunciations of the following phrases: (night rate, nitrate). «fon» ew deng e ku şêweyekî xweyî taybetî heye.

Gelek car li vir ya li dera han weha tê ku dengine qelew yan sîr nêzîkî hin dengên zimanê Arebî dibin wek: (ض), (ظ), (ص), (ط), (ل), (ر) û (پ), (ç) di Kurdî de peyda dibin û di peyvên wek li jêr hatine têne dîtin:

deng bi tîpên Arabîlatînî peyva Kurdî

ص	ss	sal (صال), se (سه)
ط	tt ʈ	(ʈa thread خيط - (toros)
ظ	zz	zzorظور
ض	dd	
P	pp	
l	ll	
r	rr	
ç	çç	
غ	gh / ğ	(ghem / ğem)
ع	ʿ / gk	me'er / megker
ح	hh	Ĥherî

Lewre pêwîst e ku ev tîpên han biçine nav sîstima Alfebêya Kurdî de. Bi serincdanê wa diyar dibê ku (عقح) di bingeha zimanê Kurdî de nînin, û evane ji zimanê Arabî hatine nav me. Lê eger em du peyvên wek (sal) bi (s)êya tenik carekê bêjin, û careke dî di heman peyvê de bi (s)êya stûr, gelo wate wê biguherê? Helbet, na. Vêca herdû dengên (s), çî ya stûr, û çî ya tenik, ti guhartinê nakin wateya peyvê de, jiber wilo jî wekû van dengan ji wan re <variants>, ango «guhartok» tê gotin, ku di tîrminolojiya zimanvanî de yek ji herduwan wek şêweyêdengê standard tê hilbijartin û di bin navê (fonêm) de tê. Dengê dîtir ku zimanzanê Kurda bi cewîbûn tanîne ziman, navê wî di zimanzanî de dibê (elofon – allophones) yê ku ji van dengan di zimanan de pirin, wek du dengên (s) yek stûr û yek asayî (normal) di van herdû peyvên de, wek:

stûr	tenik	wate
ssed	sed	100
ssal	sal	year
ssor	sor	red

Carna sînorên fonoloji û fonetîkî ji zimanekî ta yekî dîtir nabine wek hev, û eva han jî mesela (fonêm û elofon), li pêka tîrmên zimanvanî tîne meydanê. Di zimanê Kurdî de çend deng hene bi du şêweyan tîne zarkirin, yek stûr û hişk e, yê din nerm e, ew jî ev in:

S, T, P, K, Z, Ç, L, R

1- Dengê /S/:

Dengê (s) di Kurdî de yek fonêm e, lewre divê ku yek (tîp) jêre bê terxankirin, herçende di şêwedengê axaftinê de, di hin zaran de, peyda dibê, ku ji warê xwerîstiya xwey normal, yan jî standard derdikevê û

hinekî stûr dibê, lê ev stûrbûn hîç wateyeke nû bi xwe re na-ênê, bo vê yekê dengê stûr (elofon) jêre dibêjin, ku ew jî di peyvên wek (sor, sol, îsot, sotin, sed, sal, se) diyar dibê, nemaze di zarê Badînanî de. Lê ev diyardeya han di zimanê Arabî de heye û dengê (s), yê nerim fonêmek e bi şêweyê (s)êya nerim tê nivîsîn, û yê stûr fonêmekî dîtir e bi şêweyê (ss) e, jiber ku her yek ji wan wateyeke cuda didê, wek (سار - سار). Di zimanê Ingilîzî de jî dengê (s) yek fonême lê du şêwedeng jêre hene, wek (sand = lem, remil) bi (s)a normal tê zarkirin, lê (s)êya peyva (sun) a Ingilîzî hinekî stûr tê zarkirin, lewre jêre şêwedeng dibêjin, û yek (tîp) di Ingilîzî û Kurdî de jêre hatiye danîn. Jiber ku elofon di zimanvanî de wek fonêm nayê jimartin, jiber wilo jî girafîm yan şêwetîpek jêre nayê terxankirin.

Di peyvên Arabî de ku dengê (ص / ss)êya stûr têde heye, û wek fonêm xwe diyar dikê. Ev peyv dema tê nav Kurdî de dengê (ss)êya stûr ku bi Arabî (ص)e dibê (s)êya Kurdî a normal, wek :

bi Kurdî	bi Arabî	bi Kurdî	bi Arabî
Qestî	قصد	qesp	قصب
qesar, qesarçî	قصار	qesir	القصر

2- Dengê /t/:

Dengê (t) di Arabî de du fonêm in, lewre jî du tîp in (ط ، ت) weku peyvên (طاب ، تاب), ku her yek ji wan wateyekî taybetî didê, lê di zimanê Kurdî de herdû şêwe, wek Arabî, di hin zaran de peyda dibin, Lê belê di baweriya min de her yek fonêm e, û yek wate didê, çi stûr û çi nerim, lewre jî yek tîp jêre hatiye danîn. Dengê (T)êya stûr di peyvên wek:

Şewegirafîm	Girafîm	tîpên Arabî	wate
Ttarî	Tarî	طاري	dark
Ttav	Tav	طاف	sunlight
şewatt	Şewat	شە واط	burning
şewegirafîm	tîpên Arabî	girafîm	wate
Ttivir		طقر	Tivir
ttefşo		طفشو	aleteke pê kolanê dikin
ttevî	navê	ttirşikêye	
ttenbûr	navê	aleteke mosîqaye	
ttewaş	duhin, rûn		
tteyrok	zîpik		

Lê ev stûrbûn wateya peyvê naguhêrê, lewre evane dikevin ber sînore elofonan de, wek diyardeyeke dengsazî (fonetîkî) tête jimartin, ji bilî ku di warê zardevî de tête jimartin. Li vê pêkê, di Ingilîzî de jî heye (t)êya normal di peyva (ten) de, û (t)êya stûr di peyva (tall) de. Lê her yek fonêm û yek tîp jêre hatiye terxandin, ku ew jî (t)êye.

Di peyvên Arabî de ku dengê (t)êya stûr têde heye û wek fonêm xwe diyar dikê. Ev peyv dema tê nav Kurdî dengê (t)êya stûr ku bi Arabî (ط) e dibê (t)a Kurdî a normal, wek :

bi Kurdî	bi Arabî	bi Kurdî	bi Arabî
Qeht	قحط	qutnî	قطني
Qet	قطعة		
Qetran	قطران		

Dengê (d)a stûr ya Arabî di piroseya bilêvkirina Kurdî de dibê (d)a tenik ya normal, wek:

قضاء Qeda

3- Dengê (P):

Dengê (p)ê, herçende bi du şêwedengan: (nerim û stûr) tê zarkirin û carna jî du wateyan didê, wek peyva (Par: ango sala bûrî) (p) bi stûrî tê zarkirin, belê (par: ango beş yan behir) bi nermî tê axaftin. Lê eva han nakevê ber sînoren fonêman de jiber nimûneyên bi vî rengî gelek kêman in. Dengê (p)ê di yek peyvê de ji zarekî ta zarekî dîtir stûr dibê, û carna jî tenik dibê. Lewre yek (tîp) jêre dibê standard. Herçî dengên (p) hene nabine fonêm, wek:

nerim hişk wate

pend nependî nediya

pîvaz penîr (bi zarê xerbiyan) cheese

pel pez غنم

por poz bêvil

pîr pizane çêleka

4- Deng /k/:

Herçende dengê (k)ê di zimanê Kurdî de bi du şêwedengan tê gotin û du wateyên cuda di yek rîstika peyvê de didê, lê dîsa nabê wek du fonêm bête jimartin, ji ber ku nimûneyên weha gelek hindik in, wek:

hişk wate bi Arabî Nerim wate bi arabî

ken قشرة ken ضحك

ka تبين ka هات

kal	عجوز	kal	أبيض
kerr	أصم	Ker	حمار
kêr	جدير	Kêr	سكين
kil	كحل	kil (dikilê)	خض (يخض)
kak	birader	Kak	pir spî
kar	يستطيع	Kar	عمل

5- Dengê (z):

Ev deng jî, wek yên dîtir, carcaran di hin zarê Kurdî de bi stûrî tê zarkirin, lê dîsa eva han di cihekî teng de dimînê, ji bilî ku hîç wateyeke nû nadê, lewre her yek fonêm e û yek tîp e. Stûrbûna vî dengî di hin peyvên de nabê ku bibê destûreke fonêmsaziya Kurdî ku şeweyê stûr bibê fonêmeke serbixwe, jiber ku ev dengê stûr yê wek dengê (ظ) a Arabî wateya peyvê naguherênê, lewre wekû van diyardayan di sînorê elofonan de dimênin. Peyvên wek: (zzor ظور, zzirrav ظراف, zzirrî ظري) çî bi dengê asayî bêjê, û çî bi dengê stûr bê gotin, her peyv wek xwe dimênê, û hîç guhartin nakevê peyvê de.

6- Dengê (Ç):

Dengê /ç/ hincar di hin peyvên de ji awayê xweyî asayî اعتيادي der dikevê û piçekî sirt dibê, ku eva han jî ne yekî Kurd bê, ticarî pê dernaxê, wek dengê /ç/ a nerim ya (çiya) ku mebest jê bersiva (belê, yan libê) ji kesê ku ban mirov dikê, lê bi dengê piçekî sirt mebesta (çiya) ku devereke bilind wek kwêştan û zozan nîşan dikê. Weha jî (çar) bi nermî, û (çal) bi sirtî. Peyva (ço) bi herdû şeweyan heye (sirt û nerm) û her yek ji wan wateyekî ciyawaz didê, wek:

ço : 1. Sê pendên Kurdî di babeta (ço) de hene :

1. ((Ço ji ço vedigerê)). Mebest ji vê gotinê ewe ku (xurtî bi xurtiyê radiwestê. Yan jî zor zorî jêre divê)
 2. Pêşiya gotiye: - ((Heçî çowê wî stûre, arvanê wî hûre.)) (ço) dareke, bi destê xwe digrin, pê şer dikin.
 3. Ço ji cenetê hatiye.
 4. Baram bi zorçone mafê xwe stand, ya bi çowê zorê, ya bi darê zorê heqê xwe stand: - ço ji ço vedigerê
- ço : Dema ku mirovek ji kerê bixwazê bimeşê, vê gotina (ço) jêre dibêjê.

Dema mirov herdû peyvên (ço) û (çiya) danê ber lêkolîna fonêmsaziyê, dengê (ç) dibê wek fonêm, lê eger kêşe di çend nimûneyan de bimênê, û nebê diyarde, hinganê em nikarin fonêmekî dîtir bi çend peyvan druşt bikin.

Hin car û di hin peyvan de sirtbûn û hişkbûna dengêkî bi sedema dengê stûr ku bi dûde tê, wek:

Nerm sirt

bimeş(ji keran re) dibêjin ço ço navê darekêye

belê, libê çiya çiya kwêştan û zozan

40 çil çil (ççill) berçemk خفاش

çima çira çira find شمع

نماذا çire çirr dens كثيف

Qenatê Kurdo elofonên zimanê Kurdî wek fonêman wan dibînê, lewre xwestiye ku tîpan ji wan re danê bi awakî ku ji yên berê cuda bin.

Encam

Li encamê em dikarin bêjin ku dengên wek (Z, K, P, T, S, Ç) çi stûr bin, û çi nerm bin, wate peyvê naguherênin, lewre jî ligor yasaya fonêm, her yek ji van dengên ji fonêmekî pêve nadin, ku di nivîsînê de jî divê yek tîp bo her fonêmekî bête terxankirin.

Eva han jî di Alfebêya Celadet Bedirxan de xuyanî dikê ku wilo bîr biriye, û hîç şêwe tîpên ciyawaz ji hevaldengên (elofon) re nedaniye, ku ev jî şarezabûneke zimanvanî di vê babetê de didê xuyakirin. Lê zanyarê me Qenatê Kurdo di pertûka xwe de ya bi navê (Rêzimana zimanê Kurdî) weha şaş çûye ku (elofonên Kurdî) ango hevaldengên fonêman wekû fonêm dîtine, û ji wan re jî tîpên nîşandar danîne, ku her hevaldengêk niçikek daniye ser, da ku ji hevalê xwe bête cudakirin, wek:

(ç , ç') - (g, g') - (h, h') - (ç, ç') - (p, p') - (r, r') - (t , t')

Di baweriya min de Qenatê Kurdo wêneyê deng di şêweyê xwey fonetîkî de kêşaye, ne di şêweyê xwey fonêmkî de. Bi rastî ev core rênivîs durvê nivîsînê zehmet dikê, ji ber wilo jî zimanzanên cîhanê vê yekê ji rênivîsê dûr dixin. Lê Celadet û gelekên dîtir ji zimanzanên Kurda şêweyê rênivîsa Kurdî ligor fonêman zimanê Kurdî danîne, herçende ciyawazî di hin xalan de navbera wan de heye. Lewre guh nedane şêweyên deng û elefonan. Bi vî awayî jimara fonêman ji ya deng û elofonan hindiktir e, û wilo jî ziman dikarê xwe pirtir nêzîkî şêweyê standard bikê. Ji ber ku di ziman de gelek şêwe dengên zarekî yan devkî hene, nabê evane bikevin ber nivîsînê de, wekû

diyardeyeke şariştanî û netewî ber bi yekîtiya ziman de gavên xwe tavêjê.

Herçende peywendiyêke xurt navbera fonêm û deng de heye, belê cudabûneke zimanî jî navbera wan de heye, ew e ku zimanvan wa dibêjin: “Her fonêmek deng e, belê her dengê ne fonêm e”, her wilo jî di warê nivîsînê de, ne her deng divê tîpek cuda jêre hebê. Eva han jî ne tenê ji ber wê yekê ye ku giriftarî di pêşiya yekîtiya zimanê Kurdî de peyda nebin, lêbelê ev kêşe di barê zaniştî de jî her bi vî rengî tê. Di alîkî dîtir de jî îro-roj ciyawazî navbera hin dengên zimanê Kurdî de di hin zaran de pêwîstî bi yekîtiya fonêman heye, da ku em nekevin ber şap û lehiya diyalektan de, nemaze di rêjeya peyvan de, ku yek peyv bi du şêwe tê gotin û tê nivîsîn, bo nimûne:

I-

mar	me'er	مه عه ر
tal	te'el	ته عه ل
hişk	'işk	هشک عشق
hengirî	'engrî 'enirî	هه نری
zehf/zehf	ze'ef	زه عه ف
av	aw	
dev	dem	

II- Dengên hin peyv navbera xelkên Silêmanî û xelkên Hewlêrê û xelkên Kwêsinceq tîn guhartin.

Hewlêr	Silêmanî	Kwêsinceq	standard
mal	mall	mar	mal

xal xall xar xal

Ji ber vê yekê jî em nikarin dengên ziman bi şêweyekî berela danin, yan binivîsin, pêwîst e ku şêweyekî standard werê, ku her ew jî dikevê ber sînore fonêm weku pêkhênerekî giring di binyata peyvê de ya ku li şêweyekî taybet bi standarkirina forma peyva ferhengî radiwestê, bo nimûne, divê em yek formî ji van her çar formên yek peyvê hîlbijêrên, ku ew jî evin: (wilo, welê, halo, werrê) yan ji van herdûkan: (bûk, bîk). Belê ji alîkî din ve fonêm bi erkekî ferhengî ango leksîkal (lexical) radibê û wateyan nîşan dikê, wek: (par - bar). Lewre nîrxê deng weku fonêm di rêzika birek dengên dîtir de xuyanî dikê, û roleke wateyê distênê. Vê yekê jî hiştiye ku fonêm di lêkolîna zimanvanî de cihekî giring bigirê. Her weha di zarê Soranî de, û bi taybetî şêwezarê Silêmanî, eger vowel/ dengêrek ji van dengdêrên (i) , (ê) , (wî), (wê) bi dû dengê (k) yan (g) de werê, guhartin dikevê şêweyêdengê (k) û (g) ku dibine wek dengê (ç), bo nimûne:

xelkî Silêmanî xelçî Silêmanî

Diyardeyeke dîtir jî heye ku xelkên devera Xoşnaw û Dizeyî û Rewandiz û Koysinceq li Kurdistana Iraqê ji devla (mal), (kilaw) bixwênin, (mar), (kiraw) dixwênin: Lê pêwîst e (mal, kilaw) bibê şêweyê standard bête nivîsîn. Tevayiya van guhartinan dikevin ber diyardeya dengsazî de, û hîç kartêkirin bi ser rênivîsê de nebê. Lewre, zimanê Kurdî li ser sîstîma fonêmsaziyê, rênivîs û Alfebêya xwe ava dikê.

Birr IV

Zirrdeng di Zimanê Kurdî de

(q, h, g, <) / (ق - ح - غ - ع)

1. Zimanê Kurdî û Zimanê Arabî

Zimanê Kurdî yek ji wan zimanên Hindo-Iraniye, ku di binyata xweyî dengsazî û peyv sazî de ligor siruşt û awayên malbata zimanên Îranî tê. Lê jiber hoyên cogarfî û dîrokî û dînî zimanê Kurdî, wek Farisî û Tirkî, ketiye bin kartêkirina zimanê Arabî de, nemaze ji aliyê dengsaziyê ve ku deng wek biçûktirîn dane di riya wergirtina peyvên Arabî de yên ku şeweya dengên xwe di nav zimanê nû de belav kirin, û bi dirêjahiya salan re ev dengane hatin çespandin û riya xwe tede vekirin. Em tev jî dizanin ku sedema vê kartêkirinê hevpişkiya Kurda û Araba di zimanê misilmantiyê deye, nekû encama cîrantî û hawsînoriyêye. Kêşe bi xwe di riya misilmantiyê de çû serî. Sedema wê jî ew bû, ku jibîlî zimanê Arabî, nabê ti zimanên dîtir kar pê werine kirin. Lewre zimanê Arabî sebarek zîlam û pîrek û xort û jin û zarokan zimanê Qur-anê û limêjê ye, yê rabûn û rûniştina mirovan e, yê bûn û mirina wan e, yê nivêj û duayên wan e, ku evane hemî jî pêwîst bû û pêwîst e bi zimanê Arabî pêk werin, bo nimûne ta bi silav û xêrhatinê bû bi Arabî, wek :

Selam <eylekum

merhhebe

Ehlen wesehlen

inşa-el lah...

Inca zimanê Arabî bi awakî xweristî kete nav Kurdî de, û bû beşek

ji rewşenbîriya me. Jiber wilo jî Arabî hin taybetiyên sîstima xweyî dengsazî avête nav zimanê Kurdî, ku ew jî ew bû dengine Arabnîjad bi demê re û bikarhênanê re hatine nav zimanê Kurdî, nemaze ku Kurdî bi xwe zimanekî ta niha li gelek deveran li ber xwe didê bi mebesta ku ew jî wek zimanên dîtir serbest bê. Da ku bikarê mafê jiyana xwe biparêze, û wek zimanên dîtir bikar werê.

2. Çar Dengên Arabî, Şeweya Hersê Tîpan

Em ne di barê pejirandina dengên Arabî de ne, lêbelê tiştekî dîtir tê meydanê, ew jî şeweyê hersê tîpan bi Latînî wê çawe di vê lêkolînê de werê? Wek diyar e hincar min du şewe di Latînî de dane nîşankirin, ku yek jê dubarekirina birapiştê dengê Arabî wek em dubarekirina dengê (h)êya Kurdî dikê (hh/ ح) yan jî pirtir nîşaneyên tîpên Arabî li pal van dengan da ku xwêner bi serve bibê. Lê jiber ku kêşe di warê pêşniyaran de ye, ango bûn û nebûna wan di erêna de ye. Sê dengên Arabî di zimanê meyê îro de bi şeweyekî hindik bikar tên, ew jî (h, g, <) / (ح غ ع) in, herweha hin weha dibînin ku dengê (q)ê jî Arabî ye, lê jiber ku ji mêj ve ye, û cihê xwe jî di Kurdî de girtiye, îro ev deng wek fonêmekî resen tê jimartin, lewre jî ev deng hincar nakevê ber dengên Arabî de, ez bi xwe negihame rayeke tekûz di vê kêşeyê de ta ku raya xwe di nasnameya wê de bidim. Lê herwekî dengê (q) wek fonêm tê jimartin, inca ya pêwîst ew e wek heyî bikar werê, wek:

nimûne	tîpa piçûk	tîpa mezin	Tîpa Arabî
heft, hefî,	h hh	H Hh	ح

<ewr, <enirî, < Gk < Gk ع
 gar, gaz, gem / ghar, ghaz, ghem gh ğ Gh Ğ غ
 qepal, qêrîn, qirik q Q ق

Qunaxên Peydabûna Dengên Arabî:

Eger em ferhengên Kurdî vekin, emê bibînin ku vaye gelek peyvên biyanî hene ku bi şêweyên hemecor peyda dibin, ango hin peyv hene dengên biyanî di wan de ne diyar in, û hin peyv hene dengên biyanî di wan de diyar in, lewre jî ev peyv bi dengên xwe ve çî biyanî, û çî resen wilo hatine nivîsîn. Ev diyardeya han wê yekê didê nîşankirin, ku her peyvek di demeke taybet de hatiye nav zimanê Kurdî, wek em bêjin peyva Arabî: (weqt) ku di Kurdî de (wext) tê gotin, ne (weqt). Başê çima em îro vê peyvê bi /x/ dibêjin ne bi /q/, bi ser ku dengê /q/ îro-roj di nav zimanê Kurdî de bikar tê, û gelek peyvên dîtir yên biyanî hene ku dengê /q/ di wan de wek xwe maye, wek: (qîr, qîz, qet, qalûqîl, qap). Herweha ne tenê dengê /q/ lêbelê dengine dîtir jî hene ku heman şop digirin, wek em bêjin peyva (ehd) ya ku di ferhenga Hediye Himêdiye de hatiye, wek:

Ehd عهد

ehd dan

ehd kirin

Lê (ehd) bi xwe ji peyva Arabî ya (عهد) hatiye, lêbelê gelek peyvên dîtir hene yên ku dengê /ع/ di wan de heye wek xwe tene bilêvkirin, wek (<elî) bi Kurdî, û (علي) bi Arabî. Heman pirs tê bîra me: Baş e, çima wilo

çêbûye? ev dengên biyanî ku di sîstima Kurdî de nînin di hin peyvên de têne bilêvkirin, û di hin peyvên dîtir de heman deng li nik heman zarî nayên bilêvkirin? Bersiva vê pirsê ligor dîtina min ew e ku wergirtina dengên biyanî di rêveçûneke dîrokî de derbas bûye ta ku cih girtiye, ango ne heme ji pêşî ve Kurd hînî vî dengî bûne, û pê peyvîne, yan jî ev deng ne biyaniye. Încê hînbûna vî dengî di hin qunaxan de bûriye, ku ew jî ew e:

Qunaxa Yekem: Kurdîkirina Deng

Wek em tev dizanin ku wergirtina dengên biyanî di riya wergirtina peyvên ziman de çê dibê. Lê di qunaxa yekê de peyva biyanî tê wergirtin piştî avêtina dengên ku ne ji sîstima zimanê wergir e, û danîna şûngirekî, yan anîna pêguhartî li dewsa wî dengî, çi bi riya zirrdeng bê, û çi jî bi riya danîna dengê nêzî wî dengê biyanî bê, wek em bêjin dengê /p / li nik Araban nîne, lewre naçar dibin ku nêzîktirîn deng li şûnê (şûna wî) danin ku ew jî /b/ê ye wek peyva (Orupa) li ba Araban dibê: (Oruba); Yan dengê /f/ li şûna /v/êya biyanî dideynin ku peyva (şivan) a Kurdî dibê (şifan) li nik Araban, weha jî dengê /g/êya Hindoe-wrupî dibê /غ / û carna jî dibê /ج /, wek peyva (Gotê), navekî Elmanî ye, bibû navûnîşana jimarekê ji jimarên govara (Alem Elmerife) ya Kuwêti. Inca ew navê biyanî (Gotê) bi Arabî hatibû nivîsandin û weha hatibû: (جوتة). Araban jî zû ve bîr li vê kêşeyê kirine û kirasê Arabî li peyvên biyanî kirine da ligor dengû qalibê zimanê mirovê Arab bê guhartin ta radeyekî ku xwediye peyvê bi xwe jî nema êdî peyva xwe nas dikê, bo nimûne peyva (binefş)a Kurdî di Arabî de bûye (binefsec). Araban dengê yan du dengên Arabî bi ser peyva biyanîde zêde dikiirin ta ku

peyva Biyanî şêweya Arabî biştênê. Eva han jî, wek diyar e, li ser destê zimanvana druşt dibû. Di Kurdî de jî heman kêşe hebû, lê ne wek Arabî bi zanebûn diçû serî, lêbelê bi şêweyeke xweristî طبيعىava dibû. Încê di vê qunaxê de Kurd hînî zimanê Arabî nebibûn, lewre dengên Arabî jî li wan giran bû û nedikarîn wan dengên bibêjin, vêca heme yekser ew dengane dihatin wergerandin û li şûna wan, dengên Kurdî dihatin danîn, wek :

peyva Arabî Bi şêweya Kurdî

جامع	Camî
جمعة	Cimo
عطل	Etlahî
ملك الموت	Melkemot
اقرار، مقر، اعتراف	Mukir
مفتاح	Mifte
فائدة	Feyde
مقصد	Mexsed

Navên Mirova

Di baweriya min de navê mêran û jinan peyvên pêşî bûn ketine nav zimanê Kurdî de. Încê em dikarin wa bêjin ku peyvên Arabî cara pêşî di riya bankirina navan re ketine ser zimanan de. Lê ev peyvên Arabî wek xwe bi forma xweyî Arabî de nediman û ligor dengsaziya Kurdî dihatin guhartin, wek: (عثمان) bû (Osman), ku herdû dengên Arabî عث ji şêweya Kurdî hatine avêtin, û ev jî belgeyeke zimanî ye ku Kurda di despêkê de nizanîbûn vî dengî bêjin, jiber wilo jî li şûna bêjin (عثمان

) digotin (Osman) ango dengê (عث) Arabî bû (os)a Kurdî. Her weha gelek navên mirovan yê Arabnîjad ketine Kurdî de piştî ku dengên xweyî nijadî wunda kirin, wek:

Mamed,	محمد
Berhîm,	إبراهيم
Simko, Simayîl, Simê	إسماعيل
Evdile, evdilla, Evdo	عبدالله
Ehhmê, Ehhmo	أحمد
Mihhê, Mihho	محي الدين
Osê, Oskê , Osko, Osman	عثمان
Silo, Silê, Silêman	سليمان
Hhesîka, Hesê, Hhesenîko	حسن
Hisî, Hisko, Hiso, Hisê, Hesîka,	حسين
Mistê, Mišto, Miçê, Mistikê	مصطفى
Fatê, Fato, Faikê	فاطمة
Xecê, Xeco	خديجة
Helê, Helo	حليمة

Qunaxa Duwem:

Di vê qunaxê de Kurd piştî demekê ji bihîştina zimanê Arabî, nemaze zimanê Qur-anê, zimanê bideştixistina buhiştê di riya limêjan de, ev bîrûbaweriyên hanê navber du handeran de diliviye, handerê tirsê ji agirê cehnemê ji alîkî ve, û handerê misogerkirina buhiştê ji alîkî din ve, vê yeka han Kurd bi ser aliyê dînê misilmantiyê de birin, û jibo ku dînê xweyî nû baştir binasin, dest bi hînkirina zimanê Arabî kirin wek

yekem mifte di vekirina dergehê buhiştê.

Di vê qunaxê de wa diyar dibê ku Kurdan pîş bi zimanê Arabî kirine û mele û şêx û feqe û sofîyên wan çêbûne, yên ku li ber destê zanayên misilmantiyê xwendine di tekîye û hîcre û mizgeft û cihên xwendina dersên dînî de. Hikûmeta Islamî jî, bê guman, di geşkirina vê tevgerê de nemerdî nekiriye ta ku hinohino zimanê Arabî li nav Kurdan belav bûye. Helbet dengên taybet bi zimanê Arabî wek: (ع ، ق ، غ ، ح) eger di qunaxê yekê de nikarîn cihê xwe di nav Kurdan bibînin, di qunaxa duwade wê bibînin, ji ber ku mirov di riya xwendin û hînîkirin û fêrkirinê de dikarê hemî zimanan wergerê. Inca wa çêbû ku herçar dengên Arabî (ع ، ق ، غ ، ح) hatin fêrkirin. Lewre jî peyvên Arabî bi dengên xwe yên taybetî ve li ser zimanê mirovê kurd hatine gotin, wek:

Peyva Arabî Peyva Arabî bi Kurdî

نفعه	Nifhhet
عبرة	«ibret
قنفز	Qefast
ذي روح	Zîrihh
حليمة	Hhelê

Qunaxa Sêya:

Di vê qunaxê de wa çêbû ku ji van herçar dengên Arabî (ع ، ق ، غ ، ح) dengê (q) riya xwe di Kurdî de vekir, û gelek peyvên nû hatine drustî kirin. Ne tenê wilo jî hin peyvên Kurdî ku bi dengê (k) bûn, hatin guhartin bi (q) wek: (qop) ji peyva Kurdî ya (kuppiya) hatiye; û (qûn) ji peyva Kurdî

ya kevintir (kun) hatiye, jiber ku ta niha ev peyvên Kurdî yên resen di siyaqeke taybetî de bikar tên. Încê dengê (q) îrroj wek fonêmekî Kurdî tê jimartin, lêbelê ew bi xwe zirrfonêm e, ango ne fonêmekî resen e di Kurdî de. Hin zimanzan wa dibînin ku dengê (q) dengê resen e di Kurdî de, ne dût e ev jî rast bê, nemaze eger hebûna vî dengî di belgeyên kevin de isbat bû. Ji alîkî dinve hersê dengên dîtir, herçende hebûna xwe di zimanê Kurdî de çekirin, lê ne di riya peyvên nû de, ne di riya peyvên kurdnîjad de, hebûna wan tenê di riya peyvên Arabî de diyar bû. Vê yekê jî lawazî bi ser deng de anî, jiber ku ev deng di peyvên biyanî de mane bendkirî, herçende hin peyv hene di zimanê Arabî de diyar nabin, lê ev jî gelek hindik in, ta radeyekê mirov dikarê dev ji wan berdê, yan jî dengê kurdî nêzî wan û resen bikar bînin, wek em bêjin şûngirê deng, wek dengê (h) şûna (hh) di gelek peyvên de dikarê bigirê jiber ku berdêliyê wan di heye

Dengên Arabî (ص ، ط ، ث ، ض ، ظ)

Eger em li sîstîma dengsaziyê ya zimanê Kurdî xweşik binêrin, emê wa hişkere bibînin ku çend dengên Arabî wek (ص ، ط ، ث ، ض ، ظ) nikarîne cihê xwe di sîstîma zimanê Kurdî de xweşik bibînin, herçende ev dengane bi şêweyekî nêzikî wan di Kurdî de heye, lê ne di astê fonêman de ye, û ne di astê şêweya standard de ye, ango pirtir di warê zardevî de peyda dibê. Eger em li van nimûneyên jêr bixwênin:

Peyva Arabî Şêweya Kurdî

فاطمة	Fatimê	ط	1
وطني	Wetenî	ط	1

قاضی qadî / qazî	ض	2
Zerîfa ظریفه	ظ	3
Sabîr صابر	ص	4
Hharis حارث	ث	5

Diyardeya Zirrdengên (h, g, </p>
</div>
<div data-bbox="113 310 888 609" data-label="Text">
<p>Encama nebûna guhdan û dam û dezgehên pispore di zimanê Kurdî de, zimanê me bê xudî maye, û wek kerîkî bê şivan li deveran biterqehê, yan jî wek bexçekî ji xwe re şîn bibê, helbet wê gelek gelş û qelş bikevin erda wêde. Bê guman berê wê jî wê kêmbê û nexweşiyê wê jî peyda bibin. Wîlo jî hin peyvên saxlem jî di zimanê me de wê bikevin ber kartêkirina zimanên dîtir, ku hinohino ta bi dengên resen jî kirasê xwe diguherê, û kirasekî biyanî li xwe bikê. Lewre jî ya pêwîst ewe ku zimanzanên Kurda bala rewşenbîran bikşênin ser van kêşeyan, û bikarin bi awakî rast teliya xwe danin ser nexweşiyê, û ranewestîna ta ku dermanekî jêre bibînin.</p>
</div>
<div data-bbox="113 617 888 917" data-label="Text">
<p>Wek me berî niha jî dupat kir ku ev hersê deng tozîk li ser wan nîne ku ji Arabî hatine nav Kurdî û ev raştîya han ferhenga Kurdî dupat dikê, ango ev van hersê deng di wan peyvande tên yêna ku ji ferhenga Arabî hatine nav Kurdî, û ti pêwendîya van peyva bi zimanê Kurdî nîne, lewre dengên van bêjeyan jî ser bi zimanê rebîne, û bi vî awayî dengên (h, g, </p>
</div>

dengê van peyvên jêrî:

heft	bûye	hheft
heşt	bûye	hheşt
herçî/heçî	bûye	hheçî
hemi	bûye	hhemî
ta	bûye	heta
hezkirin	bûye	hhezkirin

peyva Kurdî şûngirê deng şûngirê peyvê

herrî herrî qurr

Peyvên Arabî, wek:

Şêweya Arabî	Şêweya Kurdî
h / ه	hh/ ح
qehir	qehherandin
qehwe	qehhwe

Dengê heywanan û Teyrikan û (q, h, g, <) / (ق ح غ ع):

Di zimanê Kurdî de gelek peyv hene yê ku zarbêjiya dengê heywanan dikin, û ev peyvane bi dengên Arabî (q, h, g, <) / (ق ح غ ع) despê dikin, wek:

«irr»-irra kera

«orr»-orra çêleka

«ûz»-ûza kûçika

«ewt»-ewta kûçika

qarqara van qaza

qiçeçirça
 qîjqîja
 qirqira zilama
 qebqeba kewa
 hhimhhim
 hhirrhhirra van hespa
 hhîrrhhîrra van
 hhingeding
 ghirghira van zaroka

Birr VI

Diyardeya dengên Arabî

Bê guman, diyardeya bikaranîna zirrdengan seranserî Kurdiştanê heye, eva han jî jiber hin egeran bû:

Xal 1. Kartêkirina bîra misilmantiyê wek binyateke kûr , û zimanê Arabî yê dinê islamê wek binyata seresere ku çend dengên Arabî li encamê xwe diyar kirin.

Xal 2. Nebûna hişyariyeke netewexwazane û xwezanîneke netewî **وعى** **الذات القومية** da ku bibê hêzek dijî tixumperistên hawîrdor ku nekevê bin destê keltora wan de, û xwe wek netewe û ziman ji wan cuda bikê, wekçawe Araban xwe ji vî şerî re ji berê de amade kiribûn û di aliyê ziman de jî peyvên biyanî bi dengsaziyeke Arabewane wergirtin, wek wergirtina peyva (ronak)a Kurdî û Farisî bi cil û bergên Arabî kirin, û şêweya peyvê kete kirasê Arabî de û peyv ji (ronak) bû (رونق), lêbelê jiber rîştina van dengan bi awakê wa bû, ku ji qalibê Kurdî yan Farisî dûr

bikevê, û bimebest peyv xistîne qalibekî Arabî de û bû (رونق /rewneq). Weha jî gelek gotinên dîtir hene ku zimanzanên Araban peyvên Farisî û Kurdî bi awakî Arabîkî guhartin, wekçawa «egal bi zorê li ser xelkên me-Arab kirin:

peyva biyanî şêweya Arabî

Binefş	بنفسج
democracy	ديمقراطية
Caesar	قيصر
technique	التقنية / التقانة

Xala duwa wa didê xuyanîkirin ku Arab xudan fikrekî zimanvanî bûn, nemaze, zimanê qur-anê handerek bû ji Araban re ku sîsyima dengsaziya zimanê Arabî biparêzê, belê Kurd, be pêçanewe, di bin kartêkirina dînê misilmantiyê de zimanê Arabî bi peyv û dengsaziya xwe ve bû rêberê û sereçaviyeke zimanî ji wan re, ku çî cara pêwîst pê hat, dêwla xwe bi şanazî bavêjin kaniya zimanê Eebî û jê vexun, bo nimûne, li şûna Kurd bêjin: (Filankes mir) yan bêjin (çû ber dîlovaniya Xudê), dibêjin: (filankes zi»a bû) ku ji (ضاع) a hatiye, yan jî dibêjin (filankes wefat bûye). Weha jî bi hezarê peyvên Arabî ketine nav zimanê Kurdî de, giha radeyekê ku peyvên kurdnijad jî ketine ber pêla kartêkirina dengên Arabî de, wek (asman) bû (عه سمان esman), û (aşt) a Soranî bû (عاست aşt), ango zirrdengê ع ji kû hatiye, û bo çî ev yeka han? Helbet bersiva vê pirsê pir hesanî ye, ku zimanê Kurdî ji Kevin de tûşî du giriftarên mezin bûye:

1. Nebûna berê rewşenbîrên Kurd, û li şûna wan mela û dîndar û qur-anxwên hebûn, yê ku kar jibo belavkirina zimanê Arabî dikirin.
2. Nebûna deselateke Kurdî ku wa hişt Kurd bikevin bin destê sê milletên deselatdar de, wek: Arab, Tirk, Faris.

Inca van hokarên dîrokî ku Kurd di nav miletan de nehatin jimartin, û neketin desteka netewên yekgirtî de, lewre ti millet wek jimara wanî gelek di vê cîhanê de ta niha nemane bê deselat, nemane bê hikûmet, jibîlî Kurdan pêve. Ev jî bû qedera me. Em bihêvî ne ev deselata îro li Kurdistana Iraqê heye berdewam bibê, û bibê alîkar û dergeh û delîve bo pêkanîna hemî parçeyên dîtir.

Xal 3

Eva han jî ne tenê di warê ziman de, lêbelê xwe avête warê civakî jî, wekçawe Hikûmeta Arabî li Sûriyê piştî ku hikim şand, û dar kete destê wan de, kiras û desmal û çegala xwe jî li beşek ji Kurdên Sûriyê kirin, bi mebeşa şeweguhartinê bêxin rengê milletên ne-Arab de. Tirkan jî li ser heman rêbazê dane ser piştî siyaseta Turkîkirina Kurdan, ku şifqa Atatürk hino hino Kurdan da serê xwe, û pêre jî cilûbergên Kurdî wunda bûn, û cilûbergên Turkî ketina şûnê de. Lê ji aliyê din ve, di warê şûngirê ziman de, ango bihêlin ku hin bi hin zimanê Turkî şûna zimanê Kurdî bigirê, ku vê yeka han îro-roj bi şeweyekî hişkere rengê xwe da, û li encamê Kurdên Turkiyê zimanê dêwbavên xwe jibîr kirin, û bi zimanê Tirkî dipeyvin.

Xal 4

Di vê demê de waye hin navên Kurdî di nav Araban de belav dibin, nemaze di riya malbatên Kurdên Misrê û Şamê, yên ku ji mêj ve li nav wan dijîn. Ev nav jî wek:

Bi Kurdî	Bi Arabî
Şîrîn	شیرین
Nermîn	نرمین
Nisrîn	نسرين
Rêzan	رزان
Rewan	روان
Ranya	رانيا

Dengên (ح ع غ) di Ferhengên Kurdî de

Helwêst ji van dengên biyanî sebarê ferhengên Kurdî ew e ku ligor nofê tîpên ferhengê dihat: tîpên Arabî yan tîpên Latînî, vêca em dikarin bêjin ku helwêst weha bû:

1. Ferhengên bi tîpên Latînî:

Ev nof guh li hersê dengên Arabî nedidan, bo nimûne, ferhenga Goranî dengê ح wek tîp bikar aniye, û hincar jî dengê ع wek (ç) bikar aniye, nemaze, di beşê dengdêrên wek: (î, î, u, û, o, e, a, ê)de. Goranî dengê (ح ع غ) wek tîpên serbixwe bikar anîne, tenê ev deng di nav tîpên biratîp de anîne, wek غbi (x)ê re anîne, ku şextek li ser (x) daniye, weha jî dengê ح di nav tîpa (h)ê de aniye piştî ku şextek li ser tîpa (h)ê daniye..

•